

## Jana Camêrekî!

Jana Gel ji romanên yekemîn tê hesibandin. Roman behsa êş û jana kurdan dike. Îbrahîm Ehmed romana xwe diyarê şoreşgerên Cezayirê kiriye. Roman, bi kesekî navê wî Camêr dest pê dike. Camêr gelek salan di zindanê de de maye... *Salîha Ayata / RÛPEL - 5*



## Tirkîye çi wazena?

Ez no nuşteyê xo yê ewilî de wazena rêxistinê ma yê cinîya kurde binusna. Şima zî zone ke her cayê dinya de zilm û zordarîyêka pil ewil bi taybetî serê cinîyanê ke hemverê sîstemê camerd û dewletan de vindenî de esta... *Semra Turan / RÛPEL - 9*



## Dewkula kurdî

Me digo bira dewê me nemeliqe me dikula. Dewkul êdî dibû, qul dibû. Ji dara kevotê me çekan çêdikir. Lolepa kêriyê van tiştan me dikirî. Bi şimayê bi tayê xav, bi dirêşê me didirût ciyê qul didirût. Kesê nizanibû penêr çi ye, me şîrê xwe tev dikir rûn... *Felat Nishtiman / RÛPEL - 12*


Rojnameya Heftane

# xwebûn

www.xwebun.org

6-12 Tîrmeh 2020
Hejmar: 29
Buha: 4 TL

rojname@xwebun.org


## Tevgera Chîpkoyê

Têkiliya jin-xwezayê têkiliyeke dîrokî û li gorî rastiyên heyî jî têkiliyeke şênber e. Ev têkilî hem ji aliyên lêkolînên arkeolojiyê ve hem jî di hin mîtolojiyan de hatine vegotin, di vê mijarê de gotina 'jin her tim pêşeng e' derkeve pêşiya me. Ev rastî di dîroka çalakiyên Hindistanê yên xwe ji bo xwezayê dixin pêşeng de jî derkeve heye. Çanda bêîtîatiya sivîl her çiqas bi Mahatma Ghandî hatibe naskirin jî... *RÛPEL - 2*

# Ev qêrîn ji serdestan hêvî nake

Mêvana me ya vê hejmarê, rojnamevan û xêzkara kurd Zehra Dogan e. Dogan der barê rojnamegerî û hunera xêzkariyê de pirsên me bersivandin û wiha got: "Ez dikarim bêjim ku di karên min de ne ajîtasyon lê hestên zarok û jinan hene. Ji ber wê jî ev yek serdestan aciz dike, yên êrîş dikin serdest in lê dîsa jî yên ji qêrîna me ditirsin ew in. Ji ber ku ev qêrîn ji serdestan hêvî nake, li hemberî wan e. Ne qêrîna belengazan e, qêrîna têkoşeran e. Penaberî ji bo min wekî tu kulîlkekê ji axa wê hilkî û di vazoyekê de biçînî. Lê gava welat tê bîra min; di nav dengê zarokan de bêhna nanê tenûrê tê pozê min."... *Hevpeyvîna A. Menaf Can / R.4*



# Gul li gulperestan tê



Melayê Cizîrî dibêje, gulan bidin ên xatirê wan dizanin, ji ber ku gul li gulperestan tê, ji wan re histriyên gulê jî bes in lê îro "gul" ketiye destê yên bi qedrê wan nizanin. Di dîwanê de wanî dibêje Mela:

"min di baxê gulfiroşan dî
'eceb resmek xerîb

xariteb'an gul di dest in
gulperistan xari bes"

Mihemed Arifê delaliyê ber dilê muzîka kurdî di gotinên gulêya xwe de pesnê gulê çawa tê dayîn nîşanî me dide, hîn em negihîştine wê asta:

"tava heyvê xwe avêtiye bejna gulê, li beyana sibê"...

*Mefer Kurdil / RÛPEL - 5*

## Çîroka Mîrê Botan û Ezeb axa

Li gorî gotina Silêman Axa, rojekê mirovek tê ba Mîrê Botan û jê re dibêje zilamek der barê te de gelekî tiştên nebaş diaxine, navê wî Ezeb axa ye. Mîr dibêje Ezeb axa zilamekî zana ye bawer nakim ku tiştekî wiha gotibe. Mêrik sond dixwe dibêje ew ji te xeber dide. Mîr ji xulamê xwe re dibêje ez ê te bişînim pey Ezeb axa. Dema ku xulam dike biçe pey wî zilamê ku gelaciya Ezeb axa kiriye ditirse û di dilê xwe de dibêje... *RÛPEL - 10*

**Zehra Mohammedzadeh**

Dengvedana şevê



*RÛPEL - 2*

**Felemez Ulug**

Daxuyanî têr nakin



*RÛPEL - 6*

**Kewê Redkan**


Jina serbixwe...



*RÛPEL - 10*

**Şener Ozmen**

Li Çola Xwedê!



*RÛPEL - 11*

## Xelaskirina pêşerojê û pûtepêdana paşerojê

Şewat ketîye rabirdûya kurdan, kultura maddî û manewî ya zimanê kurdî. Pêşeroja me, kultura me dişewite!.. Di sih salên dawî de dewamdarîya dengbêjîyê ketîye sekerat û krîzê!.. Ji nû ve nayê afirandin, dengbêjî gelekî hêdî bûye!.. Pratîkên îro dengbêjîyê û kultura maddî ya kurdî ji vê sekaretê xelas bike ev in: Arşîvkirin, koleksîyonkirin, katologkirin, dîjîtalîzekirin û muzekirin... *Welat Ramînazad / R.8*



## Kareografiya dengbêjiyê

Koma Mezopotamya Dansê bi kareografiyên bi kilamên dengbêjên mîna Sûsika Simo, Meryemxan û Şakiro re projeyek amade kir. Ev proje ji ber pandemiyê hatibû talokirin... *RÛPEL - 11*



# Tevgera Chîpkoyê

Têkiliya jin-xwezayê têkililyeke dîrokî û li gorî rastiyên heyî jî têkiliyeke şênber e. Ev têkilî hem ji aliyên lêkolînên arkeolojiyê ve hem jî di hin mîtolojiyan de hatine vegotin

Navenda Nûçeyan

Di sala 1730'yan de ji aliyê împaratorê Hindistanê ve, ji bo di înşaata qesrê de werin bikaranîn biryara birîna darên li derdora gundan tê dayîn. Ji ber vê biryarê, jinên gundan radibin ser pêyan û li dijî leşkerên împaratorê Hindistanê, li dora daran kom dibin. Nêzî 363 kes bi biryara ku dê darên xwe biparêzin, bi destê hevdu digirin û ji her darekê re dibin sîper, ji ber ku dar ango şînahî di baweriya hîndûîzmê de pîroz e. Lê helbet ji aliyê leşkerên împaratoriyê ve, 363 kesên li derdora daristanê bûne çeper tên qetilkirin. Piştî vê çalakiyê împaratorê Hindistanê qanûna 'êdî dar neyên birînê' derdixe. Her çiqas di çalakiyê de bedel hatibin dayîn jî, digihêje armanca xwe.

Piştî 250 salan (1970) careke din li Hindistanê li herêmên nêzî çiyayên Hîmalayan, ji aliyên hêzên dewletê ve ji bo rantê biryara birîna daran tê dayîn. Ji wê çalakiya ku di sala 1730'an de hatî kirin ve, jinên Hindistanê hêz digirin û dîsa bi heman rengî li derdora daran kom bi kom bi destê hev digirtin û li dora daran dibin xelek. Ev çalakî jî wekî Chîpko (di zimanê hindî de tê wateya pêçan, pêçandinê) tê binavkirin. Di nav sê çar salan de ev terza çalakiyê di demeke kurt de li Hindistanê belav dibe. Ev yek jî rê li ber reformên ji bo parastina hemû daristanên Hindistanê vedike. Helbet hem ji bo çalakiya yekemîn a di 1730'an de hem jî ji bo vê çalakiyê hem jin hem jî mêr li ber xwe didin lê tê zanîn ku pêşengiya van çalakiyan jinên hindistanî kirine.

Têkiliya jin-xwezayê têkililyeke dîrokî û li gorî rastiyên heyî jî têkiliyeke şênber e. Ev têkilî hem ji aliyên lêkolînên arkeolojiyê ve hem jî di hin mîtolojiyan de hatine vegotin, di vê mijarê de gotina 'jin her tim pêşeng e' derkeve pêşiya me. Ev rastî di dîroka çalakiyên Hindistanê yên xwe ji bo xwezayê dixin pêşeng de jî derkeve pêş. Çanda bêtîtatiya sivîl (çalakiyên wijdanî yên li dijî dagirkeran li ber xwe didin) her çiqas bi Mahatma Ghandî re hatibe naskirin jî, ev yek bingeha xwe ji têkiliya jin-xwezayê digire. Di çalakiya yekemîn a 1730'yan de em dikarin bêjin ku ev şêweya çalakiyê her çiqas bi baweriya hîndûîzmê ve bê girêdan jî, ev yek têkiliya jin-xwezayê bi xwe ye.

Wekî tê zanîn, pêşengiya jinên Chîpkoyê ango jinên hindistanî dibe bingeha ekofemînîzmê jî. Ev ekola ku di sala 1974'an de ji aliyê jina bi navê Françoîse d'Eaubonneyê ve wekî şoreşa ekolojiyê tê bipêşxistin û xwe li ser fikra 'ji bo xelasiya cîhanê pêşengiya jinê nebe nabe ye' bi pêş dixin. Di sala 1976'an de jî ji aliyê jina bi navê Ynestra Kîngê ve fikra 'çewisandina jinan û çewisandina xwezayê wek hev e' tê bipêşxistin.

Bizava ekofemînîzmê texrîbata xwezayê wekî berdewama pergala baviksalariyê, hişmendiya mêrê serdest, kapîtalîzm, nijadperestî û bi qeyrana ekolojiyê ve dibînin. Mêtingeriya ku li ser xwezayê tê kirin bi zordestiya li ser xwezayê tê kirin ve heman tişt e û ji bo vê yekê jî xelasiya xwazayê bi xelasiya jinê ve girêdayî ye. Azadiya wan bi hev ve girêdayî ye. Ekofemînîst di gelek çalakiyên li hemberî şerê nukleerî û di yên li dijî çekan de cih digirin. Di salên 1980'yan de bi komên aktivîstan û konferansan her diçe belav dibe. Ji Amerîkayê heta Kanada, Ewropa û Avustralyayê jî diçe.

Yên niha vê bizava ekofimînîst bi awayekî şênber didomînin jinên mîna Vandana Shivayê ne. Lê ev tevgera ku bi pêşengiya jinên Hindistanê hatibû destpêkirin, niha bi awayekî birêxistinkirî ji aliyê jinên rojavayê Kurdistanê ve û hemû jinên xwezahez ve tê domandin.









Zehra Mohammedzadeh

## Dengvedana şevê

Ez di vê baweriyê de me ku zêmar, heyranok, meselok, çîrok û çîrçîrok bi awayekî di guhê we de jî zimzimî bin, ruh dabin şevên zaroktiya we… Beriya ku hûn di xew de çûbin dengekî nerm û zîz, aram û hêdîka dest bi vegotina çîrokekê kiribe; carnan bi keder û dibe carnan jî ji sihma şevê be gerek ku wiha bi tirsê xistibe, nehiştibe çav di xew de biçin. Lê her carekê ji kariye çavên di bendewariya şevê de li pey qehremanê çîroka xwe digere, birazîne.

Zaroktiya her yek ji me zarokên kurd bi çîrok û meselokên dayik û dapîrên me dibuhirî. Çîrokan em mezin dikirin di hembêzên xwe de… Kesayetên me bi van dengvedana ji şevê şikil, çand û bîrê teşe digirt. Em nikarin bibêjin tenê zêmar, heyranok, meselok û çîrok bûn û wan bibuhirînin. Ji ber ku her çîrokê jiyanek di çavên me de dirêsand, her zêmarekê serpêhatî û her meselokekê şîretek li me dikir.

Salên dûr û dirêj bûn; ez bawer im hîn 6 salî bûm û rojek xweş ji demsala payîzê bû ku diya min dîsa wek her carê em hemû li dora xwe civandibûn û beriya ku dest bi çîroka xwe bike, bi awayekî ahiste çavek li ser me gerand ka em hemû li wir in an na!.. Wê şevê bayek hênik dihat, şevên Urmiyê êdî sar dinêrand.

Çîroka vê carê ya diya min ji me re qalê dikir, ji hemû çîrokên din cihê bû. Jixwe tişta ku hemû çîrokên wê cihê dikirin, qehreman an jî di navenda her çîroka wê de jinek hebû. Yanî her çîrok li dora jinê dihûnand. Carnan şîret, carnan ders derxistina ji bûyerekê û hin caran jî qehremanek jin ji çîrokên wê diwelidî. Her wekî zêmarên ku bi dengekî zîz û aram şevên me bi kederê dixistin. Em diketin pey vî dengî û di her reşeyekê de li serpêhatiya dayik û bapîrên xwe digeriyan. Bi kinahî çi çîrok û çi jî zêmar be, bi awayekî ew dengê xwe digehand ruhê me yê biçûk, em dikirin rêwî û bi xwe re dibirin.

Wê şevê jî çîroka keçek biçûk a 9 salî ji me re vedigot. Tevahiya çîrokê; wekî ku diya min vedigot nayê bîra min, lê ez ê hewl bidim biqasî ku tê bîra min, ji we re vebêjim.

Çîroka zaroka ku wek her zarokek wî gundî bi zora malbatê wê li ber destê melayê gund fêrî nimêj û îmanê biba, quran xitim bikira. Lê belê zarokan li derveyê vî tiştî her tişt ji bo mela dikirin. Ji paqijkirina malê, xwarin çêkirin, av germkirin û bi satilan av ji kaniya gund anîn û gelek karên din… Û mela wê her rojekê zarokekê re bigota; 'tu neçe, te hedîs baş nexwendin û ez ê taybet bi te re bixebitim'. Jixwe ji bo mela hincet jî ne hewce bûn, ew qasidê xwedê û 'xwedî îman' bû. Çi bigota rast û bê nîqaş dihat pejirand.

Rojek ji wan rojan mela piştî xwendina quranê ji Xangula 9 salî xwest ku bimîne û jê re hinek avê germ bike. Xangul ji mela ditirsî; ji ber ku beriya wê ji hevalên xwe hin tişt bihîstibûn… Lê ma dikarîn ji malbatên xwe re qala vê yekê bikin, kê wê ji wan bawer bikira!?

Xangulê li ser kaniyê bi satilan av kêşa malê û ev germ kir. Tam ku xwest ji malê derkeve mela jê re got ku ma wê bi ku de biçe; 'tu lazim e av ê bi ser min de bikî û min bişoyî'. Xangul di dilê xwe de bi hêrs bû, ew ne wek zarokên din bû û ne pêkan bû vê yekê bipejêre jî; jixwe ew xwedî ruhek serhildêr bû û wê ev yek ji mela re nehişta. Mela xwe tazî kir û çû di teştê de rûnişt. Xangulê di serê xwe de her tişt plan kiribû, ew ê derseke wisa bida mela ku careke din destê wî negiha tu zarokekî/ê… Destê xwe avêt tasika avê, lê dovre tasik hêdîka danî û satila ava birîkelî bi ser mela de rijand… Hewar hewar bi ser mela ket lê wê bi xwînsarî û tevgerên xwe yên sivik, xwe avêt derveyî malê!..

Mela ji hêrsa nedizanî ka wê çi bike. Ebayê xwe bi ser xwe de kir û bi lez xwe avêt ber deriyê mala bavê Xangula biçûk û ji wan re got ku Xangul karên ne di rê de dike, hewce ye bê tembîhkirin. Her wiha bûyer berovajî qewimîbû rave kir û da zanîn ku wî dema şîret li keça wan kiriye, keça wan jî ji hêrsa ava kel bi ser de riştiye.

Xangulê dizanî, ne bavê wê û ne jî tu bav û zilamên din ên gund wê jê bawer bikin. Ji bo wê jî li şûna ku berê xwe bide mal û gund, yekser berê xwe da gelî û çiyayên jor… Wê bi awayekî şopên xwe berze bikira; elokek serjê bikira, cilên xwe di nav xwîna wê bida û avêtiba cihekî dûr. Bi vî rengî êdî wê kesek li pey negeriyaba! Lê ma pêkan bû ew rawestiba, ew ê her rojê zarokek din tev li rêwîtiya xwe bikira…

Belê di vê çîrokê de jî dayika min em ber bi ruhek serhildêr ve dibirin, ji me dijrabûnek dixwest, dijrabûnek li hemberî her tişt an jî bûyerên ku ruhê me yê biçûk bi derba xencerê perçe perçe dikir. Dixwest em bêdeng nemînin û dengvedana xwe bidin destpêkirin. Dibe ji ber vê be ku navê Xangul û çîroka wê di hişê min de wiha zinde maye. Mîna rojên ewil hîna jî dema dengê raperîna wê dibihîzim, careke din bîbilkên çavên min wek zarokekê şa dibin. Ez bawer im min jî wê rojê zanî ku lazim e dengê xwe berz bikim, olan bidim heya çiya û zozanên welatê min bi dengê min bihesin. Lê ya herî girîng jî fêr bûm netirsim, şer bikim. Vê yekê jî fêr bûm ku pergala em tê de mezin dibim, ger em xwe bihêz û netirs nekin, ew ê hizir, bîr û hebûna me perçe perçe bike û di yek henaseyê de me daqultîne.

Ji bo wê jî mirov hewce ye bizanibe ku her çîrokek pêşerojekê ava dike. Em jî dikarin bi meselok, çîrok û çîrçîrokan, berovajî çîrokên pergalê ên hatine xemilandin û hizir û kesayeta zarokan ditevizîne, di her zarokek kurd de raperîneke nû bidin destpêkirin. Bila ew xwe bi xwe serhildana xwe bidin destpêkirin!..

# Elewî li benda lêborîna dewletê ne

Qedrî Esen



Bi ser Komkujiya Sêwazê re 27 sal derbas bûn. Li gel vê yekê jî komkujî nehatiye ronîkirin û kujerên wê nehatine cezakirin. Welatiyên elewî ji ber komkujiyê ji dewletê li benda lêborînê ne

Li Rojhilata Navîn yek ji civaka ku herî zêde rastî êrîşên hovane û komkujiyan hatiye civaka elewî ye. Bi taybetî jî di serdema osmaniyan de welatiyên elewî ji aliyê rêveberên osmaniyan ve weke zarokên damariyê hatine hesibandin û di qirkirinan re hatine derbaskirin. Ev qirkirina li dijî elewiyan heta piştî avakirina komara Tirkiyeyê jî berdewam kiriye.

Di 2'ê Tîrmeha 1993'an de jî li bajarê Sêwazê li hemberî elewiyan komkujiyeke hovane pêk hat. Beriya komkujiyê komek nivîskar, ronakbîr û hunermendên elewî ji bo bîranîna Pîr Sûltan Abdal çûn Sêwazê. Lê beriya çûnê li bajêr li dijî wan propagandayeke reş hat kirin û hedef hatin nîşandan. Roja ku gihîştin bajêr û xwestin Pîr Sûltan Abdal bi bîr bînin, bi komkujiyê re rû bir û man.

Komên nijadperest û olperest bi ser Otela Madimakê de ku nivîskar, ronakbîr û hunermendên elewî lê diman de girtin û xwestin kesên li otelê xwe radestî wan bikin. Lê ji ber ku nivîskar, ronakbîr û hunermendên elewî xwe radestî wan nekirin, komên nijadperest û olperest agir berî otelê dan û wan hemûyan şewitandin. 2 xebatkarên otelê jî di nav de, bi giştî 33 kesan canê xwe ji dest da.

**27 sal derbas bûn**

Ligel ku di ser vê komkujiyê re 27 sal derbas bûne jî, kujerên komkujiyê nehatin cezakirin û piştperdeya komkujiyê nehat zelalkirin. Kesên ku qaşo ji komkujiyê hatin darizandin jî, bi demê re hatin berdan û ser komkujiyê hat girtin.

Gelek kujerên komkujiyê derbasî welatên Ewropayê bûn û li gel navnîşanên wan ên aşkera jî nehatin girtin û li dadgehên tirkiyeyê nehatin darizandin.

Berovajiyê darizandin û cezakirinê, gelek kesên ku têliya wan di komkujiyê de hebû û parêzerên ku parastina kujeran kirin, di nav AKP û MHP'ê de siyaset kirin û bûn parlamenter. Heta hin ji van kesan di AKP'ê de wezîriyê jî kirin. Ji ber vê sedemê di dema desthilata AKP'ê de bi hinceta demboriyê ser dosyaya komkujiyê hat girtin û kujer hatin xelatkirin.

**Berê xwe didin Sêwazê**

Lê li gel van helwdanên kirêt ên li hemberî xwe jî têkoşîna welatiyên elewî ya li hemberî vê komkujiyê her berdewam kiriye. Her sal di salvegera komkujiyê de ji her dera Tirkiye û bakurê Kurdistanê elewî berê xwe didin Sêwazê û li ber Otela Madimakê 33 canên xwe bi bîr tînin û daxwaza zelalkirina qetilkirina wan dikin.

Îsal jî bi munasebeta salvegera komkujiya Sêwazê di nav hefteyê de elewiyan li gelek bajar û navçeyan çalakiyên bîranînê li dar xistin. Di roja salvegerê de berê xwe dan Sêwazê, li cihê komkujî pêk hatibû bernameyek bîranînê pêk anîn. Parlamenterên HDP û CHP'ê jî di nav de gelek nûnerên rêxistinên elewiyan tev li bernameya bîranînê bûn.

**Rêya lihevhatinê**

Di bîranînê de nûnerên rêxistinên elewiyan bal kişand ser zihniyeta ku komkujiya Sêwazê pêk aniye. Nûneran, diyar kir ku heman zihniyet îro li desthilatê ye û dê têkoşîna xwe ya li hemberî vê zihniyetê bidomînin. Her wiha nûneran, destnîşan kir ku rêya lihevhatina bi elewiyan re bi lêborînxwestinê pêkan e û ew ji dewletê li benda vê lêborînê ne.

Li gelek bajaran jî bîranînên bi hinceta vîrusa koronayê hatin astengkirin. Li Enqereyê polîsan mudaxaleyî girseya ku xwest qurbanên komujiyê bi bîr biîne kir û 7 kes binçav kirin. Lê balkêş bû îsal ji aliyê rayedarên hikûmeta AKP'ê ve der barê komkujiyê de tu daxuyanî nehat dayîn.



## Wê Iraq Tirkiyeyê li KENY'ê gilî bike

Êrîşen hewayî û bejahî yên artêşa tirk ku di 15'ê hezîranê de hatibûn destpêkirin, hefteya borî jî berdewam kirin. Di çarçoveya êrîşan de bi dehan balafir ji Amedê rabûn û gelek deverên başûrên Kurdistanê bombebaran kirin. Piraniya deverên hatin bombebarankirin heremên sivîlan bûn û ji ber vê yekê bertekên li hemberî êrîşan zêde bûn.

Di encama van bertekan de Hikûmeta Navendî ya Iraqê û Hikûmeta Herêma Kurdistanê hin hevdîtin kirin. Di hevdîtinan de her du aliyan li hev kir û hejmarek leşkerên artêşa Iraqê li ser xeta sînorê di navbera Başûr û Bakur de bi cih kirin. Bicihkirina leşkeran gelek hat şîrovekirin û ji ber vê rexne li rêveberên Herêma Kurdistanê hatin kirin.

**Leşkerên Iraqê li Zaxoyê ne**

Li ser van rexneyan rayedarên Herêma Kurdistanê angaşt kirin ku leşkerên ku li Zaxoyê hatine bicihkirin leşkerên kurd in û li ser lihevkirinê hatine bicihkirin. Rayedarên Iraqê jî der barê mijarê de ragihandin ku wan li dijî binpêkirina serweriya Iraqê leşkeran li Zaxoyê bi cih kirine.

Berdevkê Wezareta Karên Derve ya Iraqê Ahmed Sahhaf, destnîşan kir ku ji bo bersivdayîna binpêkirina serweriya xaka Iraqê hemû bijarte ji wan re vekirîne. Sahaf got ku ji niha şûn ve wê li dijî êrîşên Tirkiyeyê Yekitiya Ereban û Rêxistina Hevkariya Îslamê bikin dewrê û Tirkiyeyê li Konseya Ewlehiyê ya Neteweyên Yekbûyî (KENY) gilî bikin. *HEWLÊR*

# Parçekirina baroyan pêşkêşî meclisê kirin

Navenda Nûçeyan

AKP û MHP israra xwe ya ji bo kontrolkirina baroyan didomînin û hewl diddin baroyên bajarên mezin ên mîna Stenbol, Enqere û Îzmîrê ku bi hezaran endamên wan hene parçe bikin. Dê bi vê yekê darbeyeyeke mezin li hêza muxalif a baroyan bixin û baroyên di bin kotrola xwe de ava bikin. Di nav hefteyê de gava yekemîn a ji bo vê yekê hat avêtin û pêşniyarqanûna guhertin û parçekirina baroyan pêşkêşî serokatiya meclisê hat kirin.

Pêşniyarqanûn piştî nirxandina li komîsyonona edaletê, di rojên pêş de dê ji bo erêkirinê bê lijneya giştî ya meclisê. Serokwekîlê koma AKP'ê Cahît Ozkan der barê guhertina ku dixwazin bikin û de axivî û hurgiliyên pêşniyarqanûnê aşkera kirin. Ozkan diyar kir ku pêşniyarqanûna wan ji 28 xalan pêk tê û li bajarên mîna Stenbol, Enqere û Îzmîrê ku hejmara endamên baroyan ji 5 hezarî zêdetir e, 2 hezar parêzer bên gel hev wê bikaribin baroya duyemîn, sêyemîn ava bikin.

**Baro bên parçekirin**

Her wiha Ozkan got ku dê her baro li Yekitiya Baroyên Tirkiyeyê karibin bi 3 delege û serokekî bên temsîlkirin. Bi vê yekê dê AKP-MHP'ê baroyên mezin ên li dijî xwe parçe bikin û Rêveberiya Yekitiya Baroyên Tirkiyeyê bi hêsanî karibin bikin bin kontrola xwe. Heke ev pêşniyarqanûn bê erêkirin û bikeve meriyetê dê ji neçarî baro li gorî daxwazên AKP-MHP'ê tevbigerin.

**Bi hezaran li hev kombûn**

Roja ku pêşniyarqanûn pêşkêşî meclisê hat kirin, gelek baroyan li ber derê edliyeyên bajaran mitîngên parastinê li dar xistin. Polîsan li Edene û Amedê êrîşên parêzeran kir û nehiştin ku mitîng li dar bixin. Lê tevî hemû astengiyan jî li Stenbolê bi hezaran parêzer li hev kom bûn û mitîng li dar xistin. Serokên baroyan destnîşan kir ku tê xwestin parêzer ji hev bên cihêkirin û baroyên alîgir bên avakirin.

**Walîtî mitîng qedexe kir**

Di 3'yê tîrmehê de serokên hemû baroyan xwest li Enqereyê mitînga parastinê li dar bixin. Lê walîtiya Enqereyê bi hinceta zêdebûna weqayên vîrusa koronayê mitîng qedexe kir û nehişt ku mitîng bê lidarxistin. Li gel vê astengiya walîtiyê jî serok û rêveberên baroyan çûn Enqereyê û li ber derê Edliyeya Enqereyê daxuyaniyek dan û der barê astengiya xwe de serlêdana sûc kirin.

# Penaberan li gola Wanê dibin mirinê

Bajarê Wanê ji ber ku bajarekî li ser sînorê Îranê ye, rêya penaberên ku di ser Îranê re derbasî Tirkiyeyê dibin pê dikeve. Di salên dawîn de ji ber şer û pevçûnên navxweyî û xizaniya ji ber vê yekê hejmareke zêde welatiyên Afganistan, Pakistan û Bangladeşê bi ser Îranê de derbasî bakurê Kurdistanê dibin. Ev penaber ji vir jî dixwazin derbasî welatên Ewropayê bibin.

Heta niha piraniya van penaberan bi zor û zehmetî be jî xwe digihandin peravên Behra Egeyê û ji bo derbasbûna Yewnanistanê xwe bi kelekan li ava behrê dixistin. Di vê rêyê de gelek penaber noqî avê dibûn û difetisîn. Her sal bi dihan nûçeyên bi vî rengî di sazî û dezgehên çapemeniyê de derbas dibûn. Lê balkêş e di çend salên dawîn penaber li gola Wanê jî bi vê aqûbetê re rû bi rû dimînin.

**Hejmara penaberan ne diyar e**

Li gel rêyên bejahiyê jî "bazirganên penaberan" wan li gola Wanê dixin û dikujin. Herî dawî jî di 27'ê hezîranê de kelekeke ku 70-80 penaber tê de bûn, li gola Wanê noqî avê bû. Bi rojan e xebatên lêgerîna cenazeyên paneberan li golê didomin. Li gel xebata bi rojan jî hê tenê çend cenazeyên penaberan hatine dîtin û nayê zanîn ku çend penaber xeniqîne û çend ji wan rizgar bûne.

**Serboriya xwe vegot**

Medenî Akbaş ku ji keleka noqî avê bûye sax filitî, ji Ajansa Mezopotamyayê (MA) re axivî û qala tiştên ku hatibûn serê wan kir. Akbaş da zanîn ku di berdêla pereyan de bi pismamê xwe Serwet Akbaş re ji bo ku wan bibin Bedlîsê penaberan li girava Çarpanakê li kelekê siwar kirine û di nîvê rê de keleka wan ji ber pêlên zêde qelibiye û noqî avê bûye.

Akbaş destnîşan kir, dema ku kelek noqî avê bûye, pismamê xwe Serwet û gelek penaberan li ser avê dîtine lê piştî demekê pismamê wî canê xwe ji dest daye û li ser vê yekê bi soberiyan xwe careke din gihandiye girava Çarpanakê. *WAN*



## DI ZINDANÊ DE MIN NÎGARÊN XWE BI XWÎNÊ ÇÊKIRIN

# Huner bêsînoriya hişmendiyê ye

→ A. Menaf Can

Ez dikarim bêjim ku di karên min de ne ajîtasyon lê hestên zarok û jinan hene. Ji ber wê jî ev yek serdestan aciz dike, yên êrîş dikin serdest in lê dîsa jî yên ji qêrîna me ditirsin ew in. Ji ber ku ev qêrîn ji serdestan hêvî nake, li hemberî wan e. Ne qêrîna belengazan e, qêrîna têkoşeran e. Penaberî ji bo min wekî tu kulîlkekê ji axa wê hilkî û di vazoyekê de biçînî

**Zehra Dogan kî ye?**



Rojnamevan û xêzkara kurd, di sala 1989'an de li Mêrdînê ji dayik bûye. Li Zanîngeha Dîcleyê beşa wênesaziyê qedandiye. Sala 2012'an li ajansa JINHA'yê dest bi karê rojnamegeriyê kiriye. Di dema berxwedana xwebirêberiyê de li Nisêbînê bi sedema parvekirin û xêzên wê, di sala 2017'an de hatiye girtin. Piştî ku di 2018'an ji zindanê derdikeve ew jî berê xwe dide Ewropayê. Niha xebatên xwe yên wênesaziyê li wir berdewam dike.

*Mêvana me ya vê hejmarê, rojnamevan û xêzkara kurd Zehra Dogan e. Me pê re der barê azmûna wê ya rojnamegerî û xêzkariyê de ev hevpeyvîn kir.*



***Me tu bi nasnameya te ya rojnamegeriyê nas kirî. Bi salan di ajansa jinan de xebitiyî û di dema pêvajoya xwerêveberiyê de bûyî şahidê gelek tiştan. Dikarî hinekî behsa serpêhatiyên xwe bikî?***

Berxwedana xwerêvebirinê di dîroka kurdan de qonaxeke girîng bû. Di vê serdema girîng de, JINHA cihê xwe di warên herî zehmet de girt û xebatkarên ajansê wek rojnameger bi mehan di kolanên berxwedanê de xebitîn. Ji ber ku di vî şerî de yên herî zehmetî dikişînin jin in. Li hemberî vî şerî yê zilam daye destpêkirin, herî zêde dengê jinan bilind e. Ji ber vê yekê, me hewl da ku peyv, bertek û berxwedana jinan bi pênûsa jinan diyar bikin.

Me gelek tişt dîtin. Em bûn şahidê gelek bûyeran. Lê em gelek tiştan jî fêr bûn. Rojnamevaniya gelan her tim fêrî tiştên nû dibe. Di sala 2012'an de me bi 5 jinên kurd li bajarê Amedê dest bi weşanê kir. Ji wê rojê heta niha ajansa me kar û xebatên xwe didomîne.

***Di pêvajoya xwerêvebiriyan de te li Nisêbînê nûçegihanî kir û gelek nûçe çêkirin. Lê dema mirov vedigere li paş dinêre ji nûçeyên te bêtir, tabloyên ku te derheqê Nisêbînê de çêkirine di bîra mirovan de ne. Gelek kesan tabloya te ya Nisêbînê şibandin tabloya Guernicaya Picaso. Tu vê mijarê çawa şîrov dikî?***

Min qet texmîn nedikir ku ez ê rojekê wêneyekî wisa xêz bikim. Min beşa hunerên bedew xwend lê min her gav bûyerên xirab xêz kirin. Min qet ji bo hew "mijar" wêne saz nekir. Weneyên min ne lêgerîna disiplînên huneran in. Ez jineke kurd im, belê mijarên min zêdetir polîtîk in lê dîsa jî ji ber ku ez kurd im, ez xwe mecburî mijara bindestî an jî serpêhatiyên kurdan jî nabînim. Belê mijarên min kurdewarî ne lê ev tişt bi hestên mecbûriyetiyê nayên binavkirin. Heger xwe mecbûr bibînim, dizanim ku karê min dê bişibe hunera dema Stalîn. Wekî wê demê hew propagandatîf û kitsch. Huner bi mecbûriyetiyê nayê afirandin. Bi hunerê ez dikarim hin tiştan provake bikim lê naxwazim propagandaya wê bikim.

Vegotin û têgihîştin bi sînorbûnek giyanî ye. Huner bêsînoriya hişmendiyê ye ku tewra entropyayê jî tevlihev dike. Aşkerakirina hişmendiya entropiyayê dike. Hesteke bêpergal e. Huner çi qasî dikare biafirîne ewqas jî dikare tevlihev bike.

Wêneyên Nisêbînê jî Guernica vedihewand. Dibe ku di sadebûna vî wêneyî de, ew bêyî ku tiştekî bêje, wî xwe balkêş kir, xwe mecbûr nedît lê hîs kir lê ji nişkê ve ji hestên qewimî hate afirandin. Vê taybetmendiyê ji nişkê ve bal kişand. Vê encamê jî hêjinî afirand. Dema ku min ev wêne di nav şer de çêkir, mebesta min ne ew bû ku kesan bihêjînim. Tenê min dixwest ku tiştekî îfade bikim. Lê vê gotinê gelek kes hejand. Niha ev wêne arşîv û sembolek e. Ya ku vî wêneyî taybet dike ew e ku di nav şer de bi hestên spontane hatiye çêkirin. Lê bingeha van hestên spontane kûr e.

***Pênûsa zarokekî, şahidiya qirkirinekê û daxwaza îfadekirinê ya li ser resmekê... Ji du salan zêdetir jî ji ber van sedeman bi sucdariya propagandaya terorê, azadiya te ji te hatibû girtin. Te gotibû di navbera îfadekirina polîtîk û ajîtasyonê de xeteke zirav heye. Mirov di hûnera te de ji ajîtasyonê zêdetir qêrînekê dibîne. Lê dewlet ji vê qêrînê aciz bû ku di bingeha vê de tirs hebû. Gelo çima ji vê qêrînê ewqasî ditirsin û her wiha ev qêrîn çawa dibe propaganda?***

Bifikirin, hûn di jiyanê de herî zêde kîjan demê ji xwe yê berê hez dikin, kîjan ruh qewetê dide we? Ya min, zarokatiya min e. Ez herî zêde bi rihê zarokatiya xwe serfiraz im, çima?

Em dibêjin di ruhê zarokan de tirs tune ye ne wilo? Lê di rastiyê de her wextî em herî zêde zarokan diparêzin ku di bûyeran de hîn zêdetir ew ditirsin. Zarok, ji me bêtir bi bandor in û di nav bûyeran de ditirsin. Lê ligel vê tirsê, gava ku em giyanê zaroktiyê dibêjin, tirsên zarokantiyê nayê bîra me, serhildana wan, serrastî, rûmet û refleksên wan dibin îmaja berçavên me.

Ew ji hevokên Elîf Akbogayê yên irregular tirsiyan. Rojnivîska Elîfê, ji gelek pirtûk û nivîsên edebî bêtir bi bandor bû. Ji ber ku Elîfê ev nivîs li gor çavdêriyên xwe nivîsand. Elîf zarokek bû. Elîf mexdûr bû lê di aşkerekirina wê de nexwestina hêviyek, profîleke serbilind û balkêş hebû. Ji ber vê yekê nivîsa wê ewqas xurt bû.

Peyva "ajîtasyonê" di orîjîna xwe de ne peyveke şaş e. Bi mana tirkî hinekî qels û şaş e. Lê dîsa jî ez dikarim bêjim ku di karê min de ne ajîtasyon lê hestên zarokan hene. Di hemû karên min de hestên zarok û jinan hene. Ji ber wê jî wekî we jî got, ev serdestan aciz dike, yên êrîş dikin serdest in lê dîsa jî yên ji qêrîna me ditirsin ew in. Ji ber ku ev qêrîn ji serdestan hêvî nake, li hemberî wan e. Ne qêrîna belengazan e, qêrîna têkoşeran e.

***Di demên girtîgehê de ya ku em dizanin êrîşên derûnî jî li ser te kirine. Te porê xwe wek firçe, nebat wek boyax, cilên ku dayika te ji bo te dirûtine jî wek tûwal bi kar anîne. Herî dawî jî ji xwîna reglê te xêz çêkiriye. Her çiqas li Ewropayê ji sala 1970'an vir ve bikaranîna xwîna reglê hebe jî, ji bo civaka Kurdistanê tiştek nû ye û hê jî wek tabû tê dîtin. Te bi hesteke çawa çêkir û ji bo pêşerojê projeyên te yê bi vî awayî hene gelo?***

Car caran azmûn û gengazî dibe sedem ku hûn biryarekê bidin û hilbijartinekê pêk bînin. Ez tu caran nefikirîbûm ku rojekê, ez ê tiştên ku li Nisêbînê qewimîne nexş bikim û dîsa rojekê ez ê ji xwîna xwe û hevalên xwe ya reglê wêne saz bikim. Bîr û watedayîna min a ser tengasiyên min ji min re rêyek çêkir. Belê xwîn niha jî wekî hemî cîhanê li Kurdistanê jî wekî tabû ye. Bandora olê heye di vê tabûyê da. Di hemû olan de nêrînên li ser jinên reglbûyî hene: Jina bi regl heram e, xwarina wê bêekil û bêbereket e, jina biregl xwedê jî jê dûr ketiye, deriyê wî û guhê wî ji wê re girtî ne, mala xwe lê heram kiriye û diayên wê qebûl nake. Ê tamam min ji evdên xwedê fêm kir lê min ji xwedê qet fêm nekir. Madem her tiştî xwedê çêdike, tu tişt bê wî nabe, wî çaxî xwedê çima ji tiştê wî çêkiriye dixeyîde û heram dibîne û wekî xeydokan deriyê xwe jê re digire?

Ev dewlet hergav gelê kurd wekî mirovên heram dihesibîne. Ev dewlet zaten jinan heram dibîne. Ev jin kurd be du caran heram e. Polîtîk be sê caran heram e, di girtîgehê de be çar, pênc, şeş caran heram e. Wekî jineke ku di çavên wan de heram, min xwest ku nerazîbûna xwe bi metaforeke "heram" nîşan bidim. Wekî jineke di zindanê de tiştekî balkeş di destê min de bû. Ew jî xwîna min bû.

Piştî zindanê, min nîgarên ku bi xwînê çêkirine, li Ewropayê li gelek pêşangehan nîşan da. Navê van karan "Artêşa Sor ya di nav derpiyê min de " ye. Ev navekî pir aciz e. Mebesta min ev e ku ne tenê hêlên muhafazakar lê di heman demê de çepgirên ku di hundirê xwe da "zilaman" aciz bikim. Ji ber wê gelek kes ji min re dinivîsin û dibêjin, "ma qey tu ji xwe fedî nakî?" Na ez jixwe fedî nakim. Çima ji xwe fedî bikim?

Karên min yên bi xwînê berdevam dikin. Wekî we jî got, hunera li ser xwînê ji bo Ewropayê ne tiştekî nû ye lê belê hê jî li Ewropayê jî tabûyek e, ji bo Kurdistanê jî tabû ye. Ez dixwazim li ser vê mijarê bisekinim.

***Piştî biryara dadgehê, Banksy li New Yorkê derket holê û bi hunermendê kuçeya Borfê re ji bo azadiya te xêzek çekirin. Banksy xemginiya xwe bi New York Timesê re parve kir. Piştre jî li ser înstagramê nameya te weşand. Piştî azadiya te têkiliya we çêbû ango ji bo sibêrojê di projeyeke hevpar de em ê bikaribin navê we bi hev re bibînin?***

Piştgiriya Banksy ji bo min gelek bi rûmet e. Kesekî evqas navdar şerê li Kurdistanê anî ziman, ji bo gelê kurd ev gelek taybet e. Banksy bi karê xwe qirkirina Nisêbînê anî ziman. Bi saya piştgiriya Banksy wêneyê Nisêbînê bi awayekî berfireh hat nîşandan. Hêza hunerê jî ev e. Carna huner, bi hêza xwe ya bêdeng gelek tiştan tîne ziman. Bi vî awayî, wêneyê Nisêbînê bû sembola berxwedana Nisêbînê. Di zindanê de têkiliya min û Banksy hebû. Piştî zindanê jî têkiliya me berdewam kir û hêna jî berdewam dike. Piştî derketim wêneyekî xwe yê gava min li zindanê çêkiribû diyarî wî kir. Ji bo pêşerojê karekî bi hev re niha ne xuya ye.

***Piştî girtîgehê pêşengeha te ya yekemîn ya installation (enstalasyon) li Tate Modernê hat nîşandan. Ji bo kuratorên rojavayî wek keseke rojhilatî zêde balê dikişînî. Niha tu jî li Ewropayê hunera xwe îcra dikî. Tu qet rastî marksîzma kuratoran hatî ? Li ser pêşangehên Ewropayê çi difikirî?***

Ne tenê hunermendên ku li Ewropayê dixebitin, dibe ku hemû hunermend di bin bandora vê rewşê de dimînin. Ev handîkapeke mezin e. Niha, xebatên min ên li Ewropayê û cîhanê gelek balê dikişînin. Wekî ku we got, dibe ku ev berjewendiyeke kurtekurt be. Lê ez di vî warî de bi xebatekê re jî eleqedar nîn im. Zaten ez naxwazim her dem balê bikişînim. Ev nêzîkatî populîzmê û xelasiya mijaran bi xwe re tîne. Ez jiyaneke wilo naxwazim. Ji bilî wê mixabin, huner bûye bazarek. Ez wekî jinekê di vê çarçoveyê de dixwazim bi awayekî serbilind li ser piyan bisekinim. Zehmet e ku mirov li ser piyan bisekine û karên xwe domdar bike lê ez jinek im ku ji binesaziyeke têkoşînê têm, welatê min bi salan e di bin tundiya desthilatdaran de ye. Ji ber wê em, nêzîkatiya desthilatdaran bi saya tekoşînê ji nêz ve nasdikin. Bîrdoziya Ewropayê û nêzîkatiya wê texmîn dikim. Ji ber wê karê xwe bi tempoyeke hêdî û bi biryar dimeşînim. Belê piyaseya hunerê nas nakim. Lê berjewendiyên wê pir baş texmîn dikim. Ji ber wê yekê, li hemberî wan wekî dayika xwe disekinim. Dayika min, wekî jineke mêrdînî pir bîrbir û yeman e:)

***Tu jî niha penaberî û dema dibêjin 'penaberî', 'welat' tu çi hîs dikî?***

Salek e li vir im lê hîna jî min ji bo penaberiyê serlêdana fermî nekiriye. Wekî ku serî lê bidim ew ê bendewariya min a vegera welat qut bibe û ew ê hêviyên min bimirin. Ji ber wê yekê ez ditirsim. Ji ber ku ez bi hestên xwe dixebitim, naxwazim hestên xwe bikujim. Ji bo min penaberî wekî mirov kulîlka ji axa wan biçine û têxe vazoyekê. Lê gava welat tê bîra min; di nav dengê zarokan de bêhna nanê tenûrê tê pozê min.

# Jana Camêrekî!

Salîha Ayata

Îbrahîm Ehmed, di sala 1914’an an jî 1915’an de, li bajarê Silêmaniyê hatiye dinê. Di sala 1937’an de li Bexdayê xwendina hiquqê temam kiriye. Ji sala 1942’yan heta sala 1944’an dadgerî kiriye. Ji sala 1939’an heta sala 1949’an, li Bexdayê bi hevkariya mamoste Elaeddîn Seccadî kovara Gelawêj derxistiye. Piştre dest bi karê siyasetê dike, ji ber vê jî neçar dimîne di sala 1947’an de dev ji memûriyeta dewletê berdide. Ji sala 1947’an şûn de, wekî yek ji wan serokên PDK’ê navê wî belav dibe. Bi edîtoriya Îbrahîm Ehmed kovara Dengî Rastî tê weşandin. Piştre kovara Rizgarî diweşîne. Piştî salên 1975’an wek penaberek diçe Îngilistanê û di sala 2000’an de jî canê xwe ji dest dide. Li pey xwe gelek berhem dihêle. Yek ji van berheman jî romana li Başûr romana yekemîn tê hesibandin, Jana Gel e.

Romana Jana Gel bi zaravayê soranî hatiye nivîsandin. Ziya Avci adapteyê zaravayê kurmancî kiriye. Îbrahîm Ehmed romana Jana Gel di sala 1956’an de nivîsandiye lê wek pirtûk di sala 1972’an de hatiye weşandin. Hinek beşên romanê 1969’an de di kovara Rizgarî de hatine weşandin.

Roman behsa êş û jana kurdan dike. Îbrahîm Ehmed romana xwe diyariyê şoreşgerên Cezayirê kiriye. Roman, bi kesekî dest pê dike, navê wî jî Camêr e. Camêr gelek salan di zindanê de maye û di destpêka romanê de ji zindanê derdikeve. Ji destpêkê heta dawiyê, em dibim şahidên sê serdemên Camêr; beriya zindanê rewşa welêt, rewşa zindanê, jiyana piştî zindanê (guherîna welêt û welatiyan) biyanîtî.

Li zindanan, li derve jiyaneke tevlihev û xerîb heye. Camêr dema derdikeve derve, tîne bîra xwe ku rewşa welêt pir guheriye, beriya têkeve zindanê serhildêr zêdetir bûne û pevçûneke xurt hebûye lê piştî ji zindanê derdikeve hêzên dagirker zêdetir bûne û serhildêr jî dev ji bajêr berdane û berê xwe dane çiyayên azad. Kesên mayî jî çilmisîne û her du alî jî wan kesan wek sîxur dibînin. Camêr tîne bîra xwe çawa ketiye zindanê; tê bîra wî ku hevjîna wî ducanî ye û dê biwelide. Ji bo pîrikek bibîne derdikeve derve lê li derva çalakî dest pê kiriye. Camêr di nav çalakiyê de dimîne û tê girtin. Dema tê girtin nagihîje pîrikê û hevjîna Camêr Kalê, li malê canê xwe ji dest dide, zarok jî di zik de dimire. Heval û hogirên Camêr mirina Kalê ji Camêr vedişêrin û dibêjin; zarokek te çêbûye navê wî danîne Hêwa yanî hêvî. (Li vir xalek gelek girîng heye ku hevalên Camêr gelek baş dizanîbûn ku di dil de daxwaziya Camêr a herî mezin ew bû ku lawekî wî çêbibe. Loma dema rastiyê ji wî veşartin gotin lawikek te çêbûye) Camêr deh sal di zindanê de bi hêviya Kalê û Hêwayê dijî û tim di nav xewn û xeyalan de ye. Piştî deh salan Camêr ji zindanê derdikeve û dixwaze here ba Kalê û Hêwayê lê heta dawiya romanê nivîskar ji xwendevanan jî rewşa Kalê û Hêwayê vedişêre. Piştî ji zindanê derdikeve hevalên wî dibêjin; hevala te û zaroka te li gund in û bi wî awayî rastî dîsa ji Camêr re nabêjin. Li vir hem Camêr hem jî xwendevan di meraqeke mezin de dimînin. Camêr hewl dide biçe gund lê rewşa welêt ya tevlihev astengiyên mezin derdixin pêşberî wî. Di dawiyê de dibêjin gund hatiye bombebarankirin û Kalê û Hêwa di bombebaranê de mirine. Êdî hêviyên mayî jî têk diçin û ji bo wî tenê rêyek dimîne, rêya çiyayên azad. Piştî tev li şoreşgeran dibe gelek kêmasiyan dibîne û tim rexne dike.

**Jana nivîskar û jina xeyalî**

Piştî rexneyên Camêr em dikarin bibêjin; baweriya nivîskar li hember serhildêran qels bûye û şer caracaran serhildêr şibandine dijminên wan. Nivîskar di romanê de qala du pevçûnan dike; li aliyekî pevçûna serhildêran û gel, li aliyekî din jî şerê serhildêran û dagirkeran. Nivîskar fikrên xwe bi rêya karakterê sereke Camêr tîne ziman ku di rê û rêbazan de her du aliyan dişibîne hevdu û xeletiyên serhildêran jî vedibêje. Bi giştî di romanê de pirsgirêka vegotinê heye. Nivîskar gelek tiştan, mijaran, karakteran venabêje, tenê bi rêya kesan fikrên xwe dibêje ji ber vê jî herkes bi şêweyekê diaxive; şoreşger jî, gundî jî, dagirker jî asta axaftina wan wek hev e. Dema wisa ziman wek hev be baweriya ji karakteran jî qels dimîne. Her çiqas mijarên xwe ji êş û jana gel bigire jî hissiyatek xurt çênabe. Di romanê de nêzî pêncî mirov cih digirin lê kesên sereke pir hindik in. Roman bi giranî behsa Camêr dike û mirov dikare bibêje hema hema jin tune ye, behsa Kalê tê kirin lê ew jî xeyalek e. Ew di destpêka romanê de ducanî ye û piştre dimire lê çawa dimire çi dibe em nizanin. Roman li aliyekî şer û êşan vedibêje, li aliyê din jî qala kevneşopî û feodalîteyê dike. Jin her tim di plana duyemîn de ne. Di romanê de karakterê erênî Camêr e, (Demokrat û zana tê hesibandin) ew jî di binhişê wî de zarokek kur heye. Ji civakê cudatir nafikire.

Tirsa Kalê ya herî mezin ew e ku keçikek bîne.

“Min çend hez dikir kurek me bibûya. Janê gotina wê di devê wê de birî , dawiyê nefesek kûr kêşa û got;

-Xwedê li me negire, gelek ne xweş e, piştî ew qas eziyet û janê ji me re keçek çêbe.” (Rûpel 15)

Camêr her çi qas wan gotinan qebûl neke jî, xwestekên wî bi rêya nivîskar xwe nîşan dide ku li gorî civaka feodal dixwaze bibe bavê kurekî. Ji ber wê jin û xwestekên jinan di romanê de qet tune ne, tenê wek hêviyên mêran, dayikan û xizmetkar di romanê de cî digirin. Dîsa bi giştî di romanê de jin û mêr ji hev cuda xwarin dixwin û her tim mêr diaxivin. Jin karên malê dikin û li zarokan mêze dikin. Nivîskar xwestiye jin li gorî civaka feodal nîşan bide lê jin zêdetir biçûk kiriye û li derveyî jiyan û şoreşê hiştiye. Ligel van rastiyan jî, mirov fêm nake Îbrahîm Ehmed di romanê de jina kurd çima ew qas qels, bêhêz û tune nîşan daye.

Li vir pirseke girîng a ku divê bê pirsîn heye: Haya nivîskar ji beşdariya jinan a şoreşgerên cîhanê û cihgirtina wan a di nav têkoşînên civakî de heye? Ya din wê demê her çiqas pergaleke feodal di nav kurdan de serdest be jî, jin dîsa jî di nav malbat û civakê de xwediyê cihekî cuda ye û di kevneşopiya kurdan de jina kurd gelek caran pêşengiya civakê û mêran jî kiriye. Mirov li wêjeya kurdî ya devkî û mûzîka wan binihêre, bi hêsanî mirov dikare vê yekê bibîne. Ligel van her du rastiyan jî, mirov fêm nake ku Îbrahîm Ehmed di romanê de çima cih nedaye jinan. Ku mirov bi çavê jinê lê binihêre, ev tişt jî bo romana Jana Gel girêyeke berbiçav e û dikare bê vekolandin.




# Gul li gulperestan tê

Mefer Kurdil

Melayê Cizîrî dibêje, gulan bidin ên bi xatirê wan dizanin. Ji ber ku gul li gulperestan tê, ji wan re histriyên gulê jî bes e lê îro "gul" ketiye destê yên bi qedrê wan nizanin.

Di dîwanê de wanî dibêje Mela:

*"min di baxê gulfiroşan dî ‘eceb resmek xerîb xariteb’an gul di dest in gulperistan xari bes..."*

Ez dixwazim îro qala çend "gulên" muzîka kurdî bikim. Beriya ku ew gulên bêhnxweş di destên "gulfiroşan" de biçilmisin û hişk bibin û biçin...

Mihemed Arifê delaliyê ber dilê muzîka kurdî di gotinên gulêya xwe de, pesnê gulê çawa tê dayîn nîşanî me dide, hîn em negihiştine wê astê:

"tava heyvê xwe avêtiye bejna gulê, li beyana sibê."

Mihemed Arif li ser rêya Melayê Cizîrî ye, yê gulê nade destê tu kesan û wê weke ala evîndaran hildide jorîn. Wexta bi wî dengê xwe yê nemir her ku dibêje "gul gulê" bêhna gulan difûre ji derdora wî û ji zimanê wî, Mihemed Arifê ku ji muzîka kurdî re gelek gul hiştine.

Ew gula ku Şivan Perwer ji destê Mihemed Arifî girtiye û gerandiye li ser şopa wî, Şivanî neheqî li gulê nekiriye û jê re gotiye ji min dûr nekeve:

"li ber çavê'm her û were / wey gul, wey gul, gulîzer..."

Li ser vê rêya bexçên gulan Mihemed Arif û Şivan ji me re gul baş berhev kirine.

Ew gula ku Mihemed Arif ji destên Mela girtibû, Emerê Le’lê ji destê wî girt û nivîsand û da destê Mihemed Şêxoyî bi awaza "ay lê gulê" stra û bi navûdeng bû gulê.

Her ku Mihemed Şêxoyî gotî "ay lê gulê" dilê kurdan weke alakê li ber bê bû. Ew gula ku "nade bi malê dinê û li ser tê kuştinê" Mihemed Şêxoyî jî gulperestekî li gorî dilê Melayî û li gorî dilê Rêncber bû.

Gula di destê Mihemed Şêxoyî de derbasî destê Ciwanê muzîka kurdî ya modern; derbasî ber dilê Ciwan Hacoyî bû û bêhna gulê geştir bû. Wî bêhna gulan belav kir li nav kurdan. Bi gotinên Dîlberê Hacoyî, pêşeroja gulê dît û got:

"Çi gulek rind û ciwan/ Perîşan bû li cîhan..."

Ciwanê di zor û zehmetiyan de helbestan weke helbestvanekî dixwend û pesnê gulê dida li dinyê. Û Ciwan hey li xwe zêde dikir, "Ger ez bimirim, ger bêm kuştin, hûn li gulê bipirsin."

Îro li ser rêya van gulan, ew bêhna ku li dinyê belav bûye ez dixwazim li wê "gulê" bipirsim; gul kengî kete destê "gulfiroşan" ew gulfiroşên ku pêlî gulan dikin û distrên. Ev ala gula muzîka kurdî divê vegere ser rêya ruhê xwe, divê gulperest li gulê xwedî derkevin. Muzîka kurdî ew ê bi wan hilbibe li jor û ew ê bibe li gorî dilê Melayî, li gorî dilê Qedrî Canî û li gorî ew Cegerxwînê ku "dil bi gul dida". Ew gula sor divê em "bîn bikin dor bi dor" ji bo neçilmise di destên "gulfiroşên" kor de.

Mihemed Arifê ku stûna muzîka modern danîbû, di navbera dengbêjî û stranbêjiyê de mîna pireke ji gulan di dilê me de rêyeke dirêj vekiribû. Bi kurmanciya xwe ya zelal û paqij weke taseke avê danî ber me.

Û ew Mihemed Şêxoyê ku 41 salan emir kir, li tu welatan nestrî, tenê di stranan de dijiya awaz û muzîkên ji me re hiştin ne ji bo ku em lê kêm bikin û tew em navê wî ji bîr bikin; xortên me li xwe danaynin bêjin ev muzîka ez nan jê dixwim a nemir Mihemed Şêxoyî ye; divê heta niha me tiştinan lê zêde kiribûya, em hîn û hîn ji kîsê wî dixwin, ji wî dilê wî yê perîşan. Û ne bi kurmanciya gulperestan bi ya gulfiroşan.

Di vê rêya ku "xariteb’an gul di dest in" divê gulperistan" li gulê bipirsin û gulê bi dest bixin.

Wexta ku di stranekê de peyvek tê guhertin çîroka wî zimanî jî wenda dibe; wexta ku çîrok wenda dibe, dîrok jî wenda dibe; wexta Feqîr Ehmed li ser "riya Kobaniyê" be û em berê wî bidin ser "rêya kobarê" em ê hîn gelek gulan wenda bikin.

Bi hêviya ku gulê muzîka kurdî hişk nebin!



Mem Avba

## Gelo Kazimî jî bi derdê Qasim diçe?

Di dîroka nêz a Iraqê de navê General Ebdulkerîm Qasim xwedî cihekî giring e. Piraniya pêkhateyên Iraqê jî bi erênî behsa Qasim dikin. Baş e di rastiyê de Ebdulkerîm Qasim kî ye?

Ebdulkerîm Qasim, ji pêkhateya nasyonalist a erebî e. Lê paşê felsefeya sosyalîzmê nas dike û li Iraqê dibe şopdarekî wê yê xurt. Qasim, bi alîkariya çend fermandarên payebilind ên leşkerî sala 1958'an bi darbeyeke leşkerî dawî li qraltiya Melîk Faysalê 2'yemîn tîne û li Iraqê pergala komarê ava dike.

Di vê serdemê de pêla pergala komargerî û sosyalîzmê li Iraqê (li tevahiya herêmê jî) her diçe bilind dibe. Ev jî rastî nerazîbûna şahidiya Îranê û DYA'yê tê. Lewma salên 1959 û 1963'yan du caran li hemberî Ebdulkerîm Qasim hewldana darbeya leşkerî pêk tê. Di 1959'an de hewldana yekem a darbeyê nagihîje armanca xwe lê darbeya duyemîn a 1963'yan li hemberî Ebdulkerîm Qasim ku Baasa Iraqê pêşengiya wê dikir, pêk tê û digihê encamê. Bi vê darbeyê, li Iraqê dawî li pergala komargeriyê tê û sîstema Baasa sunnîger tê ser desthilatdariyê. Jixwe tê zanîn ku ev pergala xwe dispêre nijadperestiya erebî ya sunnî heta sala 2003'ya bi destwerdana DYA'yê û hilweşandina rejîma Seddam Huseyîn didome…

Di vê heyamê de ku cîhan bi du birdoziyên serdest ên weke kapîtalîzm û sosyalîzma pêkhatî dihat birêveberin, sîstema komargerî weke alternatîfekê derdiket pêş û zêdetir ji bendewariyên xelkê re dibû bersiv. Lê belê pergala DYA'yê ya kapîtalist ji vê pêşketinê nerazî bû. Bi destwerdanê, yan jî bi hilweşandinê divê bixista xizmeta xwe.

Ji sala 2003'yan ve pergal hat guhertin, hilbijartin çêbûn, kes û eniyên cuda hatin desthilatdariyê. Lê belê qeyrana civakî-siyasî-leşkerî-aborî hwd. kûrtir, firehtir bûne û bûne girekorek. Nexasim bi derketina DAIŞ'ê, derketina hinek hêzên din ên leşkerî-siyasî li Iraqê pirsgirêk kûrtir bûye. Piştî hemû hewldanên çareseriyê yên di nav pergala Iraqê de bê encam man, herî dawî Mistefa Kazimî weke figurekî rizgarker ku hîç nedihat nasîn, derkete holê. Baş e Mistefa Kazimî kî ye, dixwaze çi bike û kî li pişt wî ye?

Mistefa Kazimî, kesayetekî şia û xwedî feraseta neteweperestiya erebî ye. Lê belê heta niha jî rûyê xwe yê rast nîşan nedaye ku xwedî kîjan birdoziyê ye. Ev mijar zelal e ku Kazimî berê di nav istixbarata Iraqê de cih girtiye; pêwendî û girêdanên wî yên kûr bi îstixbaratên herêmî û cîhanî re hene. Lewre der barê xalên lawaz ên hundirîn û derveyî de serwext e…

Di dema teqdîmkirina Mistefa Kazimî ya ji bo serokwezîrtiyê de DYA'yê li Iraqê manewrayeke siyasî kir: ew jî 'pak-kirina Sedam Huseyîn bû!' Ango got 'çekên Sedam Huseyîn ên kîmyewî nîn bûn'. DYA'yê bi vê gavê xwest dilê aliyê sunnî xweş bike, bi şiayan re lihevkirinê bide çêkirin ku her du alî jî piştevaniya Kazimî bikin. Ev manewraya siyasî ya DYA'yê di rastiya xwe de ji bo mayîndekirina hebûna xwe ya li Iraqê bû ku bikare hebûna Îranê lawaz û bêbandor bike. Kazimî, bi angaşta çareserkirina 'xalên sor' hat ser desthilatdariyê. Çi ne ew xal heta niha kesî nekariye çareser bike?

✓Divê hinek komên di nav Heşdî Şebî de ku nêzî Îranê ne divê bên bêbandorkirin.

✓ Parastina binke û baregehên DYA'yê û mayîndekirina hebûna wê ya li Iraqê.

✓ Sînordarkirina desthilatên federalî (hikûmeta herêma Kurdistanê-Şengal) û li seranserê sînor serwerkirina artêşa Iraqê!

✓ Li ser navê zêdekirina îtîbara dewletê dixwaze hemû hêza çek û çekdaran ji zagona fedaralî derxe, bixe bin kontrola desthilatdariya navendî.

✓ Dixwaze hemû deriyên sînor û çavkaniyên sererd û binerd bixe bin serweriya desthilatdariya navendî.

✓ Dîsa divê Kazimî di demeke kurt de serjimariyê çêke û welat ji hilbijartineke asayî re amade bike.

✓ Qedandina gendeliya aborî-siyasî-ewlehî..!

Heta niha bi qasî aşkera bûye yek ji yên piştgiriyê didin Kazimî DYA ye û beşek ji xelkê Iraqê ye…

Gelo çiqas pêkan e ku Kazimî bi ser bixe? Bi destgirtina van xalên sor dê Kazimî Iraqê bigihîne aramiyê, yan hilweşînê? Gelo Kazimî jî dê bi derdê Qasim biçe yan na? Gelo wiha bidome di Iraqê de wê şerekî navxweyî pêk were û dîsa DYA (NATO) bibe 'rizgarker û hewariyê demokrasiyê!'

# WHO: Rewşa heyî krîtîk e

Navenda Nûçeyan



Ligel pêvajoya asayîbûnê dest pê kir jî belavbûna vîrusa koronayê (Covid-19) didome. Li tevahiya cîhanê heta niha nêzî 11 milyon kes bi vîrusa koronayê ketine û nêzî 600 hezar kes jî canê xwe ji dest dane. Niha tenê bi bikaranîna maskeyan dixwazin pêşî li ber belavbûna vîrusê bigirin. Lê daneyên dawiyê nîşan didin ku bi maskeyan ev pêvajoya asayîbûnê bi rê ve naçe.

Li gorî daneyên hefteya borî li welatên ku herî zêde ji vîrusê bi bandor bûne Amerîka, Brezîlya, Rûsya, Hindistan, Îngilistan, Perû, Şîlî, Spanya, Îtalya, Meksîka, Îran, Pakistan, Tirkiye, Almanya, Fransa, Kanada, Belçîka, Ekvador, Iraq û Afrîka ye.

Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê (WHO), di daxuyaniya xwe ya hefteya borî de, diyar kir ku piştî rakirina tedbîran hejmara nexweşan zêde bû. Dîrektorê Rojhilata Navîn a WHO'yê Ahmed Mandharî, destnîşan kir ku Rojhilata Navîn niha di rewşeke krîtîk de ye û got: "Li gorî daneyên meha adarê niha li Rojhilata Navîn hejmar zêde ye. Ev tişt ji ber rakirina tedbîran pêk hat."

**Rewşa Celaliyan ne diyar e**

Li girtîgehên Tirkiyeyê xetere hê jî didome. Xizmên girtiyan tirs û fikarên xwe bi her awayî tînin ziman lê rayedarên dewletê daxwaza malbatan piştguh dike. Her wiha rewşa Zeynep Celaliyan jî hê jî di xeterê de ye. Li gorî nûçeya Komeleya Mafê Mirovan a Kurdistanê (KMMK) hêzên rejîma Îranê girtiya siyasî ya kurd Zeyneb Celaliyan ji girtîgeha Qerçek ya Weramîn veguhesti cihek nediyar. Her wiha der barê Celaliyan de agahî nedane malbatê jî. Hat diyar kirin ku hêzên Îranê di heman demê de, ji ber nerazîbûna veguhastina Celaliyan êrîşî girtiya siyasî ya kurd Soheyla Hejab kirine û Hajab ji dest û lingên xwe birîndar bûye. Her wiha Zeyneb Celaliyan, Soheyla Hejab û Sekîne Perwane yên li girtîgeha Qerçekî dimînin, ji bo daxwazên bên qebûlkirin dest bi gireva birçîbûnê kiribûn.

**Tenduristiya gel nayê parastin**

Li Tirkiyeyê her ku diçe hejmara kesên bi vîrusê dikevin zêdetir dibin. Li gorî daneyên Wezareta Tenduristiyê ya Tirkiyeyê herî zêde nexweş li Stenbol, Enqere, Dîlok, Bûrsa, Konya û Amedê hene. Ligel zêdebûna hejmarê niha tenê banga bikaranîna maskeyan tê kirin. Her wiha hat diyar kirin ku li qeymeqamiya navçeya Çukurova ya Edeneyê xebatkarek bi nexweşiyê ketiye lê belê tedbîr nehatine girtin. Bertekên li hemberî tedbîrnegirtinê di nav hefteyê de jî berdewam kirin.

**40 karker bi vîrusê ketin**

Li navçeya Şemrexê ya Mêrdînê, 40 karkerên di înşaata rêya hesin a di navbera Mêrdîn û Amedê ya Kargeha Etî Bakirê ya Holdîng Cengîz de dixebitin, bi vîrusa koronayê ketin. Karkerên ku encamên testên wan pozîtîf derketin, li nexweşxaneyên Mêrdîn, Şemrex û Dêrikê hatin tedawîkirin. Ligel ku 40 karker bi vîrusê ketine jî li şantiyê bi sedan karkerên din tên xebitandin û destûr nayê dayîn ku ji bo tedbîrê biçin malên xwe jî. Raketina li şantiyê li karkeran tê ferzkirin û kesên ku dixwazin biçin malên xwe jî gefa ji karderxistinê li wan tê xwarin. Her wiha di meha gulanê de jî li heman şantiyeyê karker li dijî şert û mercên xebatê çalakî li dar xistibûn,118 karker ji ber ku tev li çalakiyê bûn ji kar hatin derxistin.

**Fîrmayan karê xwe kêm kirin**

Odeya Pîşesazî û Bazirganiyê ya Amedê (DTSO) û Herêma Pîşesaziyê ya Organîzeyê (OSB) bi xebateke hevpar der barê bandora vîrusa koronayê ya li ser fîrmayên OSB'ê de lêkolînek kir. Di lêkolînê de ji 212 fîrmayên OSB'ê bi 152 fîrmayan re rûbirû hevdîtin hatin kirin. Di encamê de hat diyarkirin ku li Amedê ji sedî 82'yê fîrmayan ji pêvajoya vîrusê bi bandor bûne. Fîrmayan, di vê povajoyê de hilberîn rawestandiye û kêm kiriye.

Xweşkanî



Felemez Ulug

## Li dijî êrîşan daxuyanî ter nakin

Têkoşîna li hemberî operasyona dagirkirina başûrê Kurdistanê, pêwîst e tenê ne leşkerî be. Ji ber ku armanca vê operasyonê tunekirina destkefyên gelê kurd e, wê demê divê gelê kurd jî bi hemû pêkhateyên xwe li hemberî vê êrîşa dagirkeriyê bi awayekî tund bisekine.

Bêguman di vê operasyonê de PKK hincet e. Em jî bi nekin ku ev demek dirêj e artêşa dewleta tirk di bin navê têkoşîna qaşo li hemberî PKK'ê de xwe li başûrê Kurdistanê bi cih dike. Li gelek cihên ku qet PKK lê nîne û tu eleqeya wê bi hebûna PKK'ê ve tune ye artêşa tirk xwe bi cih kiriye. Her dem PKK ji bo dewleta tirk bûye hinceta ku ew derbasî nav axa başûrê Kurdistanê bibe. Bêguman di siyaseta peritî de PDK'ê jî bi hemû pêkahateyên xwe ve, her tim bûye aliyê hêzên dagirker. Di vê operasyonê de ya li dijî herêma Heftanînê de tê kirin jî rola sereke ya PDK'ê ye. Ger PDK di dijminatiya PKK'ê de ewqas çavê xwe sor nekiriba û bi dijminê gelê kurd re neketiba nav hevkariyê, li herêmê ewqas êşên mezin nedihatin jiyîn.

Niha di vê rewşa heyî de mijara gotinê êrîşên li ser îradeya gelekî ye. Li hemberî van êrîşan ji gelek partî û saziyên başûrê Kurdistanê bertek hatin nîşandan lê ev pêvajo tenê bi daxuyaniyên şermezarkirinê nikare bê derbaskirin.

Em jî bi nekin ku li hemberî hebûna kurdan fobiya dewleta tirk gihaştiye asta nexweşiyê. Bi taybetî jî destkeftiyên li başûrê Kurdistanê hatine bidestxistin, her diçe di wan de dibe dert û kul. Lewma ji bo xwe ji vî derdî xilas bikin jî bi hin hêzên herêmê re ketin nav liv û tevgerê. Di van êrîşan de yên li ser başûrê Kurdistanê tên kirin, dewleta tirk bi PDK û Îranê re bi koordîne ye. Her çiqas Îran û PDK di vê mijarê de rengê xwe diyar nekin jî, ev operasyon bi hevkariya wan tê meşandin.

Armanca vê operasyonê tenê ne leşkerî ye. Bi vî rengî neyarên gelê kurd dixwazin partî û saziyên kurdistanî bibin dijî hev û di navbera wan de nakokiyan ava bikin. Bi vî rengî hem dixwazin bertekên li dijî operasyonê lewaz bikin, hem jî bi saya van nakokiyan li herêmê destê PDK'ê xurt bikin. Ji bo PDK di aliyê kurd de bi awayekî rehet bikaribe hişmendiyekê li gorî berjewendiyên xwe ava bike beriya her tiştî pêwîst e di nav kurdan de bîr û baweriya yekitiyê xira bibe. Lewma beşa operasyonê ya siyasî û îstixbarî li gorî berjewendiyên PDK'ê bi pêş dikeve. Lê ji bo PDK'ê ev demkî ne. Ji ber ku dewleta tirk tu carî bi awayekî stratejîk nêzî kurdan nabe û bi wan re tifaqên bingehîn çênake. Ji ber vê yekê tirk jî bo bigihêjin armanca xwe PDK'ê mîna amûrekê bi kar tînin. Pêwîst e rêvebiriya PDK'ê vê bibîne.

Bêguman PDK jî di ferqa vê de ye lê li ruxmî hemû êşên hatine jiyîn, dixwaze di cîhana kapîtalîst de ji xwe re cihekî çêbike. PDK bi van emelên xwe ji nirxên xwe yên kurdistanî dûr ketiye. Ji ber PDK'ê berjewendiyên xwe ji berjewendiyên gelê kurd mezintir dibîne, îro bi dijminê bavê xwe re di heman eniyê de ye. Lê divê ji bîr neke ku dijminê bavan nabin dostên lawan!

## Malbatên êzidî vegeriyan Şengalê

Komîsyona Pêşwazîkirina Koçberan a Şengalê bi daxuyaniyekê ragihand ku di meha hezîranê de 913 malbatên Êzidî li warê xwe vegeriyane. Komîsyonê da zanîn ku vegera li Şengalê rojane berdewam dike.

Komên çete yên DAIŞ'ê di sala 2014'an de li Şengalê komkujiyeke mezin kirin û bajar dagir kirin. Bi hezaran kes hatin qetilkirin, bi hezaran hatin revandin û bi dehhezaran êzdî jî koçberî cih û warên cuda bûn. Bi rizgarkirina Şengalê û bi avakirina Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Şengalê re Şengal veguherî yek ji cihên herî bi ewle yên Iraqê. Bi vê yekê re jî vegera ber bi Şengalê re roj bi roj zêdetir dibe.

Rêveberiya Xweser a Demokratîk a Şengalê ji bo pêşwazîkirina koçberan 15'ê gulana 2020'an de komîsyonek ava kir. Komîsyonê têkildarî karê xwe yê meha hezîranê daxuyaniyek weşand. Di daxuyaniyê de hat bibîrxistin ku komîsyon ji saziyên rêveberiyê û ewlekariyê yên Şengalê pêk tê û bi karê pêşwazîkirina koçberan, afirandina şert û mercên vegerê tevgeriya ye. Di daxuyaniyê de hat destnîşankirin ku beşek ji malên şêniyên herêmê hatine rûxandin û li hin herêmên Şengalê binesaziya av û ceyranê ji ber şer hatine rûxandin û wan jî hewl dane xizmetguzariyê li wan herêman bikin.

Her wiha ji ber nebûna derfetên koçberên vedigerin, wan bi balhilgirên şaredariyê alîkariya veguhestina malê şêniyan kirine, malên wan paqij kirine û ew li malan bi cih kirine. Li gorî daxuyaniya komîsyonê, di nav mehekê de 913 şengaliyên li kampên başûrê Kurdistanê vegeriyane gund û navçeyên Şengalê û vegera wan rojane dewam dike. Komîsyona Pêşwazîkirina Koçberan a Şengalê di dawiyê de bang li şengaliyên li kampan kir ku vegerin ser xaka xwe û xwedî li Şengalê derkevin. *ŞENGAL*

## Leşkerên tecawizkar ji artêşê hatin avêtin!

Li Kolombiyayê, tê gotin ku endamên artêşa ji sala 2016'an ve li dijî zarokan bi sedan carî sûcên êrîşa zayendî pêk anîne. Li gorî daxuyaniya Fermandarê Hêzên Bejahî yên Kolombiyayê Edûardo Zapateîro, di encama lêpirsîna li nav yekîneyan de aşkera bû ku herî kêm 118 leşker û efseran li hemberî zarokan êrîşa zayendî pêk anîne. Zapateîro diyar kir, 45 leşker ji nav artêşê hatine avêtin û lêpirsîna 73 leşkaran jî didome.

Zapateîro ragihand ku lêpirsîn li ser sûcên ji sala 2016'an û vir ve hatine kirin tê meşandin û bi dozgeriyê re tê birêvebirin. Daxuyaniya têkildarî sûcên li dijî mirovahiyê ku ji aliyê leşkeran ve hatin kirin, piştî xwepêşandanên xwecihî hate dayîn. Di 25'ê hezîranê de şêniyên xwecihî Embera Chamî yên li rojavayê welêt, çalakî pêk anî. Di çalakiyê de revandina zaroka 13 salî ya ji aliyê leşkeran ve û destavêtina li wê zarokê hat şermezarkirin. Piştî ku bûyer aşkera bû û 7 leşker li garnîzoneke leşkerî hatibûn destgîrkirin. Aşkera bûbû ku sê serpel jî di nav van kesan de hebûn. Nifûsa Kolombiyayê 49 milyon e û di sala 2019'an de 22 hezar zarok ên herî kêm 18 salî bûn, bi êrîşa zayendî re rûbirû mane û her wiha 708 zarok jî hatine kuştin. *BOGOTA*

# Gelo çima bêdeng in!

Jinên kurd êrîşên li hemberî Başûr û Rojava şermezar kirin, bertek nîşanî bêdengiya sazî û dezgehên mafên mirovan û Yekitiya Neteweyî dan. Jinan banga darizandina sûcdaran kir

Navenda Nûçeyan



Bertek û nêrazîbûnên li hemberî erîşên li ser başûr û rojavayê Kurdistanê didomin. Bi taybetî vê hefteyê nêrazîbûnên jinan li pêş bûn. Li rojava, bakur û başûrê Kurdistanê jinan bi daxuyanî û çalakiyan êrîşen pêk hatin şermezar kirin. Di çalakiyên xwe de bêtir li ser bêdeniya Yekitiya Neteweyî, sazî, dezgehên sivîl û rêxistinên mafên mirovan ên navneteweyî rawestiyan.

Jinan destnîşan kir ku bêdengiya cîhanê ya li hemberî êrîşan tê wateya erêkirina êrîşan. Jinên li wargeha penaberan a Şehîd Rûstem Cûdî (Mexmûr) li dijî bêhelwestiya hikûmeta Iraqê ya li hemberî êrîşan, nameyek ji Komîsyona Bilind a Mafê Mirovan ya Iraqê re şandin û di nameya xwe de cih dan kiryarên li hemberî wargehê. Her wiha Koordînasyona Kongreya Star a Rojavayê Kurdistanê jî nameyek ji serok û Federasyona Rûsyayê re şand. Me xwest em naveroka nameya jinan bikin mijara vê hefteyê.

Jinên Mexmûrê di nameya xwe de wiha behsa serpêhatiyên xwe kirin: "Em penaber in û rêwiyên guhertina 9 waran in. Em ji ber zilma dewleta tirk derbasî xaka Herêma Kurdistanê bûn. Di her guhertina cih û warekê de me warek xira kir û yek din ava kir.

Xaka Mezepotamyayê ji gelek netewe, çand û baweriyan re malovanî kiriye. Lê belê ligel vê dewlemendiya xaka Mezopotamyayê jî ji ber polîtîkayên dewleta tirk di sala 1990 û 1992'yan de 4 hezar û 500 gundên me hatin şewitandin, bi sedan welatî hatin qetilkirin, bi hezaran mirov cih û warên xwe terk kirin. Di sala 1998'an de bi destûra dewleta Iraqê û Neteweyên Yekbuyî em hatin li vê derê bi cih bûn. Ev 20 sal in em li herêma Mexmûrê dijîn.

**Jiyana di xetereyê de...**

Ji sala 1998'an heya 2014'an em dikarin bêjin ligel her tiştî jiyana me penaberan heya asteke diyar di bin ewlehiyê de bû û gelek pêwîstiyên me penaberan ji aliyê dewleta Iraqê û Neteweyên Yekbûyî ve dihatin dabînkirin. Piştî êrîşên çeteyên DAIŞ'ê yên sala 2014'an û şûnde hem jiyana gelê wargehê ket xeteriyeke mezin, hem jî di aliyê debarkirinê de gel ket nav tengasiyên mezin. Ji sala 2014'an heya roja me ya îro bi dehan caran çeteyên DAIŞ'ê êrîş pêk anîn.

Niha ji 12 hezarî zêdetir kes li wargehê dijîn. Li wargehê zarok, jin, extiyar û nexweşên giran hene. Ji ber ku em penaber in û wargeheke penaberan e hemû derfetên me yên jiyanê sînordar in. Jixwe derûniya penaberiyê, kêmderfetî, êş û hesreta warên bab û kalên me ya di dil de dibe derdek dikeve dilê mirov. Di êrîşan de bi temamî jiyana me dikeve bin xeteriyê.

**Li vir ewlehî tune ye**

Ji sala 2017'an ve heta îro wargeha Mexmûrê 5 caran ji hêla balafirên şer ên dewleta tirk ve hatin bombekirin. Di van bombebaranan de gelek hemwelatiyên wargehê hatin qetilkirin û birîndar bûn. Em gelek caran dipirsin çawa çêdibe ku balafirên dewletekê sînorên dewletekê derbas dike? Wargeha me hem di bin ewlehiya dewleta Iraqê û hem jî di bin ya Neteweyên Yekbûyî de ye. Lê çima bêdeng û bêhelwest in.

Niha tu ewlehiya jiyana me nîne, em li ser xaka Iraqê dijîn û em li vir penaber in bi destûra wan li vir bi cih bûne. Lê em dibînin ewlehiya me tune ye. Serweriya xaka Iraqê tê binpêkirin. Gelo çima destûr ji van êrîşên hewayî re tên dayîn? Gelo çima sahaya hewayî ji van balafiran re nayê girtin? Çima li beramberî van êrîşan ya pêwîst nayê kirin?"

## Çima pêşî li êrîşan nayê girtin?

Di êrîşa 23'yê hezîranê ya li hemberî gundê Helincê yê bajarê Kobanê de, Endama Koordînasyona Kongreya Star a Herêma Firatê Zehra Berkel, ji Rêvebera Kongreya Star Hebûn Mele Xelîl û Emîne Mihemed Weysî canê xwe ji dest dabûn. Jinên rojavayî di nav hefteyê de bi çalakiyên curbicur qetilkirina jinan şermezar kirin. Koordînasyona Kongreya Star a Rojava jî ji Serok û Federasyona Rûsyayê re nameyek şand. Jinan di nameya xwe de bal kişand ser bêdengiya raya giştî. Lê belê nameya jinan ji hêla serok û Federasyona Rûsyayê ve nehat qebûlkirin.

Jinan di destpêka nameya xwe de bal kişand ser êrîşa pêk hatî. Di nameya jinan de ev tişt cih girtin: "Di 23'yê hezîrana 2020'an de careke din em bûn şahidê sûcê şer. Emîne Mihemed Weysî, Zehra Berkel û Hebûn Mele Xelîl li gundê Helinceya Kobanê ji aliyê balafirên keşfê ve hatin hedefgirtin û hatin qetilkirin. Ji ber vî sûcî em ji hikûmeta Rûsyayê û hêzên wê yên li Sûriyeyê daxwaz dikin ku ji erkên xwe rabin û pêşî li van êrîşan bigirin.

Li herêmê gelek sûcên şer hatin kirin. Wekî mînak li Serêkaniyê li dijî sivîlan çekên kîmyewî hatin bikaranîn. Ev yek di cotmeh û mijdara 2019'an de hat belgekirin. Tirkiyeyê tu carî dev ji êrişên xwe yên li ser niştecihên sivîl û êrîşên leşkerî yên li dijî xelkên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê nesekinand. Li herêmên dagirkirî yên wekî Efrîn, Girê Spî û Serêkaniyê kiryarên dijmirovahî tên kirin. Qetilkirin, revandin û îşkence her roj berdewam dike. Jin jî rastî her cure îşkenceyê tên. Jin hedef tên girtin. Em banga li serok û hikûmeta Federasyona Rûsyayê dikin û dibêjin li dijî êrîşan divê gavên bi lez bên avêtin."

# 'Li dijî kuştina jinan em ê li qadan bin'

Meclisa Jinan a Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) ligel xebatên giştî yên partiyê xebatên xwe yên xweser didomîne.

Meclisa Jinan a HDP'ê jî bi navê "Têkoşîna jinê li her derê ye" kampanyayek dabûn destpêkirin û xwestin balê bikişînin ser mijarên sereke yên Tirkiyeyê. Di çarçoveya kampanyayê de gelek çalakî bername hatin lidarxistin. Jin kampanyaya xwe dê bi meşan bi dawî bikin. Dê li 5 bajaran meş bê lidarxistin.



Berdevka Meclisa Jinan a HDP'ê û parlamentera Êlihê Ayşe Acar Başaran der barê kampanya û armanca kampanyayê de nêrîna xwe anî ziman û got: "Ji ber kiryarên desthilatdariyê her roj jin tên kuştin. Li gorî danayên fermî di dema AKP'ê de 7 hezar û 500 jin hatin qetilkirin. Di nav van daneyan de û hejmarên fermî de, hejmara mirinên jinan ên bi guman cih nagirin. Di rastiyê de rewşa heyî hin giran û xeternak in. Li Agiriyê tenê di nav 35 rojan de 5 mirinên jinan ên bi guman rû dan. Lê ev bûyer weke xwekuştinê derbasî qeydên fermî bûn."

Kuştin û xwekuştina jinê tu carî bala rayedarên dewletê nakişîne, Başaran mijar wiha nirxand: "Ger Meclis vê rewşê lêkolîn neke, gelo wê kî lêkolîn bike? Divê meclis vê berpirsiyariya xwe bi cih bîne. Em baş dizanin ku siyaseta desthilatdariya AKP'ê dijminatiyê dike."

Başaran di dawiya axaftina xwe de bal kişand ser kampanyayê û got: "Em dixwazin mijarên ku tên paşguhkirin bînin ziman. Em ê çalakiyên xwe yên li dijî kuştinên jinan bidomînin. Ji bo ku em dengê jinan biling bikin em ê li 5 bajaran meş li dar bixin. Yek ji van bajaran jî, bajarê Agiriyê ye. Ji ber ku îro li Agiriyê tundiya li dijî jinan û xwekuştinên jinan zêde bûye. Dûre em ê li Dêrsimê meşa xwe dewam bikin. Ji bo pirsîna aqûbeta Gulistan Doku. Piştre jî em ê li Stenbolê bin." *ENQERE*




# Xelaskirina pêşerojê û pûtepêdana paşerojê

**Welat Ramînazad**

Etîmolojîya peyva "dengbêj"ê ji hêla felsefeya zimannasîyê ve gelekî cîyawaz e: Deng + bêj, ne gotin+bêj. Di nivîsa xwe ya "Albûma Botan û Vejandina Dengan" de min hinekî li têkilîya deng û gotinê kolabû. Deng bi ruh, bîra kolektîv û metafîzîkê re têkildar e.

Dengbêjî parastin û dewamdarîya hêbûna kurdan e. Heger îro kurd nebûbin xwelîya dîrokê, ev bi xêra dengbêjîyê ye. Xwedê rasterast kîtabek ji kurdan ra neşandîye. Lê mirov dikare bêje ku dengbêjî kîtaba pîroz a kurdan e. Çimkî fonksîyona dengbêjîyê jî wekî ya kîtabeke pîroz e. Qesta min bi vê gotinê çi ye? Dengbêjîyê wekî kîtabeke pîroz kurdî parastîye, nehiştîye ku kurd tune bibin û bibin xwelîya zemanî. Dengbêjî nebûya kurdan nikarîbû bîst û neh caran serî hildin. Ger kurdan bîst û neh caran serî hildabe, bandora dengbêjîyê tê de gelekî mezin e.

Dengbêjî; tarîxnasî ye û bi muzîkê qeydkirina tarîxê ye. Dengbêjî parastin û ji nû ve afirandina bîra kolektîv e. Li ser bûyerên dîroka kurdan ji nivîsîna kîtab û gotaran zêdetir, kilam hatine gotin. Kîtab nikarin xwe bigihînin her kesî lê kilam dikarin. Çend roj berîya vê li ser komkujîya Gêlîyê Zîlanê min hinek lêkolîn kir. Li ser komkujîyê çend heb kîtab hatine nivîsandin û belgefîlm hatine çêkirin. Lê kilamên dengbêjan li ser Gêlîyê Zîlanê deranîne ji kîtab û belgefîlman zêdetir in. Nifşa Y'yê ya kurdan nîvenîv, nifşa Z'yê bi piranî ji bîra kolektîv a dengbêjîyê qut bûye. Em nifşa Y'yê ne, em rasterast ne bi kilamên dengbêjan; bi stranên di qasetan de mezin bûn. Ji ber vê bîra me ya kolektîv pir ne xurt e.

Dengbêjî parastin û ji nû ve afirandina zimên e; estetîkkirin, dewlemendkirin û pêşvexistina wî ye.

Hem afirandin û hem jî tunekirina kulturekê gelek salan li ber xwe dide. Li Tirkiyeyê ji bilî kurdîya kirmancî û kurmancî qala hêbûna 35 ziman û zaravayan tê kirin. Ji ber hemû plan û programên asmîlasyonê yên giran, sed sal in kurdî wekî wan 35 ziman û zaravayan tune nebûye, ew hê jî li ber xwe dide. Di vê berxwedanê de bandora dengbêjîyê gelekî mezin e. Ji ber ku di çanda zimanên din de hêzeke wekî dengbêjîyê ya sed salan tunebû, ew zû asîmîle bûn.

Şewat ketîye rabirdûya kurdan, kultura maddî û manewî ya zimanê kurdî. Pêşaroja me, kultura me dişewite!..

Di sih salên dawî de dewamdarîya dengbêjîyê ketîye sekerat û krîzê!.. Ji nû ve nayê afiriandin, dengbêjî gelekî hêdî bûye!..

Di fîlma Kilama Dayika Min a Erol Mîntaşî de sehneyek heye, temaşekeran gelekî diêşîne û diqehirîne; lehengê fîlmê ji bo dayika xwe digere ku qaseta dengbêjekî peyda bike. Ji bo vê yekê xwe digihîne dengbêjekî li Stenbolê dijî. Di wê sehneyê de em xanîyên zahf xirab û hilweşîyayî, bêkesbûn, bêxwedîbûn û tenêtîya dengbêj dibînin ku ew li ber mirinê ye!.. Ew ji lehengê fîlmê re wiha dibêje: "Dema ez mirim şaredarî wê hemû tiştên min bavêje çopê." Bêxwedîbûn û bêkesbûna wî dengbêjî temsîla bêkesî û bêxwedîtîya kultura me û muzîka kurdî ya tradîsyonî ye. Tiştên bavêjin çopê ne qaset, cil û berg, kelûpelên wî kurdî yên şexsî ne; dengbêjî ye, kultura me û muzîka me ya gelêrî ye. Sekerata wî dengbêjî nîşan dide ku zimanê me, kultura me, foklora me, rabirdûya me bi xwe li ber mirinê ye!..

Carekê min ji hevalekî xwe yê colemêrgî pirsî, "Tu navê çend dengbêjên colemergî dizanî?" Çi heyf ku hevalê min nikaribû navê yekî jî bêje. Li bakurê welatê me bi tevahî çend dengbêj hene? Pênc hezar in, deh hezar in an jî bîst hezar? Ji wan kilamên çendan hatine berhevkirin û dîjîtalîzekirin? Arşîva çendan temam e? Çi xebat li ser dengbêjan û dengbêjîyê hatine kirin? Xebatên bîyografîk, yên berhevkarî û antolojîyê ji tilîyên du destan derbas nabin. Çend qasetên dengbêjan ên bi amatorî hatine qeydkirin niha dîjîtal in?

Li Rojhilat, Başûr, Rojava û Bakur heta niha çend albûm hatine çêkirin? Em pirsa xwe bes li ser Bakur bikin; niha li Bakur baş an jî xirab qet ferq nake, heta niha çend qaset, CD û albûmên dîjîtal hatine derxistin? Ji salên heftêyan heta îro li Bakur kultureke maddî ya muzîka kurdî ya teknolojîk çêbûye; wekî qaset, CD, poster û radyoyan. Ji bilî çend arşîv û berhevkirinên şexsî xebatên arşîvkirin, çêkirina koleksîyonan, katologkirin, dîjîtalîzekirin û amadekirina muzeyan hema hema qet tiştek çênebûye.

Ji ber ku konteksta nivîsê mûzîk e, wan prosesan bi muzîkê sînordar dikim. Nola amûrên çandinîyê, gundewarîyê û metaryalên folklorê gelek tişt hene ku divê gavek berî gavekê bên arşîvkirin, koleksîyonên wan werin çêkirin, ew bên katalogîzekirin, dîjîtalîzekirin û di muzeyan de werin parastin û nîşandan. Li gorî yên din metaryalên folklorê yên zimanî piçekî din zêde hatine berhevkirin. Mînak Ehmedê Dirihî navên kulîlk û nebatan, Dilawer Zeraq biwêj berhev kirin. Weşanxaneya Wardozê hewl dide berhemên devkî yên folklorê berhev bike.

"Bimekankirina zemanî" û veguhastina rabirdûyê bi dahatuyê ve, pûtepêdana paşerojê bi prosesên arşîv, koleksîyon, katolog, dîjîtalîzasyon û muzekirinê pêk tên. Mesela heger koleksîyonkirin, arşîvkirin, katologkirin nebûna ne Umberto Eco ne jî Orhan Pamuk nikaribûn romanên bi wî rengî binivîsin. Gava zeman bi mekan bû edî nayê jibîrkirin. Romanûsên kurd nikarin romanên dirokî yên baş binivîsin çimkî ji bilî xeyalan, şûnwarên dîrokî, çend kîtaban, mînyaturên Şerefnameyê û fotografên kurdan ku ew jî bîyanî û mîsyoneran kişandine tiştên me yên maddî tune ne.

Pratîkên îro dengbêjîyê û kultura maddî ya kurdî ji vê sekaretê xelas bike ev in: Arşîvkirin, koleksîyonkirin, katologkirin, dîjîtalîzekirin û muzekirin. Tiştê meriv pê dilxweş û hêvîdar bibe ew e ku sazîyeke me heye, dest bi van xebatan kiriye.

Berîya niha bi salekê li Almanyayê Deutsch-Kurdisches Kulturinstitut ango Enstîtûya Çanda Kurd û Elmanî hat avakirin. DKKI'yê çend rojan berê berhemên projeya xwe ya bêhempa, Dîjîtalîzekirina Kilamên Radyoya Erîvanê li ser platformên dîjîtal belav kirin. Wê projeyê di medyayê de deng veda, ew bû sedema hêvîgeşî û keyfxweşîyê…

Xebat û projeyên bi vî rengî xelaskirina rabirdûyê ne û pûtepêdana dahatûyê ne. Xebat û projeyên wisa encamên xwe yên mezin ne tavilê, bi wextê re nîşan didin. Wekî din jî MA Musicê mekteba dengbêjîyê vekirîye. Ji bo ji nû ve afirandinê û dewamdarîya dengbêjîyê karekî hêyatî û ferz e. Hêja ye ku ev pratîk bibe mijara nivîseke din.

DKKI dê xebatên xwe berfirehtir, sîstematîktir bike. Ew ê ji bo tevahîya dengbêjîye qasetên amotor ên di qulên dîwaran de mane derîne. Ew ê seba mûzîka kurdî ya teknolojîk bixebite û projeyan li dar bixe. Bi vî awayî dê hem dengbêjîyê ji sekeratê xelas bike, hem jî qismekî kultura maddî ya kurdan veguhêze dahatûyê. Ji bo dahatûya muzîka me wê encamên gelekî baş derîne.

A girîng ev e; divê em her şixulî li DKKI'yê bar nekin, çanda kurdî bi wan sînordar û xwe jî zahf teral nekin. Hewce ye em jî li ser bifikirin, xwe bieşînin û hewl bidin ku em bi xwe dezge û sazîyan bi vî rengî, li welatê xwe ava bikin û bixebitin. Lazim e heta ji me tê em barê DKKI'yê, sazî û kesên xwedanxîret sivik bikin. Çimkî ev karê civakî û kulturî barê me hemûyan e.

Bi hêvîya DKKI bibe dezgeheke sedan salan…

# Dizê aqil, ruh û sincê

**Bahoz Azad**

Berê şev tarî bûn lê mejî û dil ronî bûn. Dil û hest germ û geş bûn. Xeyal kûr bûn. Hevî zêde bûn. Ked pîroz bû. Afirandin pîroz bû. Ziman û çand bîra jiyanê bûn. Jiyana civakî xurt bû. Parvekirin û hezkirin zêde bû. Sinc û wîcdan, parazvaniya nirxên civakî dikir. Mirovan tenê rûyê hev nedidîtin. Ruhê hev jî didîtin û hîs dikirin. Tifaqa civakî pir xurt bû. Cîrantî pir xurt bû û nirxê herî pîroz bû. Mirovan xweza, xwezayê jî mirov diparastin. Serfxurî heram bû. Hilberîn pîroz bû. Ji ber vê yekê bû ku yên ked û hilberîna wan kêm bûya, cihê wan di nav civakê de tune bû. Mirovan sewal, sewalan jî mirov xwedî dikirin. Mirovan keriyên pez, naxirên dewaran û kewarên mozên xwe di demsalên bihar û havînan de dibirin zozanên herî bilind û bi çîçekên herî bêhnxweş û ava herî pak û sar xwedî dikirin. Sewalan jî li hemberî vê keda mirovan şîr, penêr, hingiv û berhemên herî xweş didan mirovan û mirov bi berhemên xwe xwedî dikirin. Dengê av, ba, çûkan guh di zingirandin. Bêhna bax û bostan, gul û kulîlkan sermest dikirin.

Mirovan berê bi roj, bi hev re karên zibareyê dikirin, bi şev jî bi hev re di şevbuhêrkan de kom dibûn. Agir hebû, çira û fanos hebûn. Di şevan de li ber ronahiya çirayê, fanosê, lempê û lokizê civat geş dibû. Cîran li hev kom dibûn. Qala serpêhatî, çîrok, kilamên şer û evîniyê û boçûnên xwe dikirin. Her şev aqil û bîrên xwe nûjen dikirin. Bîrên xwe kûr dikirin. Mirov û mirov, mirov û sewal di nav hev de bi hev re bûn, jiyan hevpar bû.

Piştî zilam mudaxaleyî xwezayê kir, serdestî û serwerî li ser xwezayê kir. Zilamê serdestî li ser xwezayê kir, vê carê hikum li ser jin û civakê kir. Niha jî li ser navê xizmeta civakî, nûjenî, estetîk, xweşikî û pêşketinê, bêtir mirov û civaka bêaqil, bêsinc, bêruh, bêhest û bêked ava dike. Bêtir serfkarî, betalî, xizanî û nezaniyê bi pêş dixe. Zilamê li ser xwezayê serdestî bi pêş xist, serwext nebû ku ew xweza ye û xweza ew e. Ferq nekirin ku bi mudaxaleya xwezayê mudaxaleyî xwe dikin. Teknolojî bi pêş xistin, lê ked kuştin. Amûrê afirandinê bi pêş xistin lê afirandina mejiyê civakî kuştin. Ceyran afirandin, şev ronî kirin lê dil tarî kirin. Şev ronî kirin lê çav û mejî kor kirin.

Li ser navê xizmeta mirovan amûrên ragihandinê bi pêş xistin lê mirov bêtir ji hev dûr xistin. Seyare afirandin, telefon afirandin lê temasa mirovan cemidandin. Her ku li ser navê xizmeta civakê amûrên hilberîn, ragihandinê bi pêş xistin, bêtir mejî û çav kor kirin, beden teral kirin û ruh sist û mest kirin. Nexweşiya sersariyê belav kirin. Teqet û hewldan kuştin. Jiyana takekesî belav kirin û dîwarên bê kevir û ruh bilind kirin. Bi telefonên biaqil, mirovên bêaqil zêde kirin. Bi teknolojiya ragihandin û elektronîkê, mirovên robotî û elektronîk afirandin. Robotên bigoşt û hestî lê mirovên bêruh û mejî afirandin.

Ceyran hat bajar û gundan. Kolanên bajar, tax û gundan ronî kirin, mal ronî kirin lê dil, hest û raman tarî kirin. Jiyana kolektîf hilweşand, sinc rûxand û wicdan nehiştin. Bi ceyran û telefonên biaqil êdî civakek bêsinc, bêaqil, bêruh û kole afirandin. Bi ceyran û telefonê keda mirovan, aqilê mirovan, sinc û wîcdanê mirovan dizîn. Mirov û civaka bêruh, bêsinc û bêmejî, bêçand û bêziman ava kirin. Gelo haya me çiqas ji vê rastiyê heye?

# Tarîxê dewleta tirke tarîxê qetlîyaman o

Mehmet Şahîn

Dewleta tirke ser hişmendîya Îtîhat Terakî ya yew netew, yew ziwan û yew kultirî de awa bîya. Netewo tirk, ziwanê tirkî û kultirê tirkî yo îslamo sinî esas girewte. Serê heme şaranê Anatolya û Kurdistanî de tirkbiyayîş ame ferzkerdiş. Ya do heme bi bibayêne tirk ya zî do heme bi qirkerdişan biameyêne çinêkerdiş. Komelê ke tirkbiyayîş û çinêbiyayîşê xo qebûl nêkerdî se serro bi qirkerdiş û trajediyê zaf girdan reyde ri bi ri manenê. Coka merdim bi rihetî şikeno vaco ke tarîxê dewleta tirke tarixê komkujiyan o.

Yê ku ver zilmê hişmendîya Îtîhat Terakî de çonk nêdayî ro û heta nika xover dayî komelê kurd û komelê elewîyan ê. Komelê kurd û komelê elewîyan komelê tewr qedîm û kevnareyê na erdnîgarîyê. Mixabin di na se serre de yê ke tewr zêde amê qetilkerdiş û hemayke yenê qetilkerdiş Kurd û Elewîyê. Qetlîyamê Koçgirî, Dêrsimî, Çorûmî, Meletî, Gurgumî, Gazî, Agirî, Amed, Dêrahêne, Geliyê Zeylan, 33 guleyî, Roboskî, Sûrî, Şirnek, Cizîr, Nisêybîn, Licê û Pasûr tenê çend mînakê.

Ê qetlîyaman ra ê tewr xidar 2'ê Temmûza 1993'an de Sêwaz de pêk ame. 27 serrî verêjoy di serra 1993'an de Komeleya Kultirî ya Pîr Siltan Abdalî qabê vîrardişê Pîr Siltan Abdalî şaristanê Sêwazî de aktîvîteyêk viraşte. 30'ê hezîrane de bi desan roşinvîr, hunermend û nûştoxê Elewî û sosyalîstan qabê tevirbiyayîşê vîrardişî verê xo dayî Sêwazî.

Azîz Nesînî di rojnameyê xo yê bi namê "Aydınlık" de qalê kitêbê Salman Ruştî yo "Ayetê Şeytanî" kerd. Azîz Nesînî kitêb îngilîzîra açarnayo tirkî. (Peyra lacê Azîz Nesînî Ahmed Nesînî di nûşteyêk xo de vano; 'Dogu Perînçekî bê xeberê babê min a xeber di rojnameyê Aydinlikî de dawo nûştiş- yanî di miyanê a plansaziyê qetlîyamî de D. Perînçekî zî esto) Coka miyanê înan de estbiyayîşê Azîz Nesînî qabe plansazîyê destê dewlete yo tarî firset bî. Bi şiyayîşê nê hunermend, nûştox û roşinvîran destê dewlete yo tarî ke dest bi xebatanê xo kerd. Bi çapemenîyê xo û bi sixuranê xo roj bi roj propogandaya 'enê heme bê dînê û bê îmanê û her roje nengan dînê ma ra çînenê' kerd. Bi na propogandaya xwe ya zurîkere şarê Sêwazî tahrîk kerd û hêrsê şarî zêde kerd...

Roja 2'ê Temûze de roja îne de çarçoveya plansazîyê de qadê aktîveteyî de bi def û zirna şahî bibî. Provokatorî kewtî meydan û vatî; no def û zirna qabê vengê melayî nêro ma danê piro. Melayê camiyanî ke paştî dayê provokatoran û verê şarî dayî qadê vîrardişî. Bi diruşmeyê "Enê zindikê vengê melay birnenê, Sêwaz do bibo goristanê laîkan, Cûmhuriyet Sêwaz de awan biya do Sêwaz de bi qedîyo, Do Sêwaz bibo goristanê Azîzî" û dest bi rayraşîyayîşî kerdî. Roca îne de şaro ke xutbera veciyayê şanê înan dima. Miyanê çend dekayan de verê Otelê Madimakî de bi des hezaran kesî kom biyî.

Qaşo esker û polîsê qabê ewlehiye amabî ewja, la verê çimanê înan de wesayîtanê meymanan weşnenê qet mudaxele nêkenê, adir erzenê otel mudaxale nêkenê îtfayeya ke yena adirî hewnakera nêverdenê nêzdî adirî biba, vengê xo nêkenê û mudaxale nêkenê. Roşinvîrê ke otele de mesûr mendê ro walî geyrenê, ro midûrê polîsan geyrenê, ro serekwezîr Ç.Çiler geyrenê, ro wezîrê karê zerî geyrenê, ro fermandarê eskerî geyrenê heme benê ker, kor û lal. O cehnem 12 saetî dewam keno la heme rayedarê dewlete tenê temaşe kenê.

Verê çimanê esker û polîsan de hovê barbaran o wehşeto xidar viraşt. 51 kesî bi îmkananê xo miyanê ê adirê cehnemî ra veciyenê la 33 roşinbîrî, hunermendî, nûştoxî, 33 canî di Otela Madîmakî de bi awayeko ganî, miyanê qîrî û hewarî de weşînayî. Bêguman no qetlîyam zî fina heme qetlîyamê bînan plansazî yê dewlete bî. Heke plansaziyê dewlete nêbê 33 canî verê çimanê rayedarê dewlete de, verê kamerayan de ganî nêameyêne weşnayene.

Ez wazena namê ê 33 canê ke ê wehşetî de cuya xo vinî kerdî tîya biyara vîrî. Hozan Muhlîs Akarsû, nûştox Asim Bezîrcî, Hozan Nesîmî Çîmen, Hasret Gultekîn, şair û nûştox Metîn Altiok, xêzkarê karîkatorî Asaf Koçak, şair Behçet Sefa Aysan, rojnameger Mehmet Kaynak, Şair Ûgur Kaynar, hunermend Edîbe Sûlarî, di way birayê 12 û 15 serey Koray û Menekşe Kaya yî, di wayê 16 û 17 sereyî Asûman û Yasemîn Sîvrî û meymanê înan ya Holandayî ya wendoxê zanîngehî Carîna Cûana miyanê ê 33 kesan de bîyî.

Bê guman no qetlîyam tenê qetlîyamê elewîyan nêbî. Şexsê înan de bêveng kerdişê heme mûxalîfan bî. O wext îktîdar de koalisyon estbî û siyaset xetemîyaye bî. Kurdistan de xoverdayîşê kurdan roj bi roj xurt biyê. Têkilîya mabeynê komelê elewî û xoverdayîşê komelê kurd roj bi roj xurt biyê. Xoverdayîşê sendîqayanê kedkaran xurt bibî û wendoxê zanîngehan her roj di çalakiyan de bî. Hişmendîya dewleta tarî bi qetlîyamê Madimakî waşt heme beşê komelî bitersno, bi ceresno û bêveng bikero.




**Vatişê serokwezîra aye wextî**

Tansû Çîlere; "Zaf şikir çîk bi şarê ma nêbîyo". Vatişê Serekomarê aye wextî S. Demîrelî; "Mesela munferîda, tahrîkêk giran esto, badê tahrîko giranî şarê ma hêrs bîyo, çi destê polîs û eskeranê ma ra ameyo kerdo, pêrodayîş çin o, tenê otele ameya weşnayîş û çend kesan cuya xwe dest da". Vatişê wezîrê karê zerî Mehmet Gazîoglu: "Azîz Nesînî bawerîya komelî rê bêhurmetî kerdo, coka komel taxrîk bîyo û hêrsê xo nîşan dayo". Bi awayek zelal nîşanê ma danê ke weşnayîşê 33 canî qerar o plasaziyê dewlete bi xo yo.

Dewleta tirke qabê ke riyê xo yo tarî bilimina dadê qetlîyamî 3ê Temûze de 190 kesan girewtî binçim. Înan ra 124 kesî tefqîf kerdî. La nîyetê dewlete ê cezakerdişê înan çinî ya. Rayedarê dewlete heme ro qatilan wayir vecîyenê û wazenê înan mesûm nîşan bidê. Dewa Sêwazî ra benê Anqara. Roniştişo yewîn 21'ê teşrîna verêna 1993'î de virazîyeno. Qerarê mehkema yo yewîne serrîyêk badê qetlîyamî 26'ê kanûna 1994'an de yeno dayiş. Qerarî de 22 kesan rê 15 serrî, 3 kesan rê 10 serrî, 54 kesan rê 3 serrî, 6 kesan rê 2 serrî ceza ameye birnayîş. 37 kesan berat kerd. Mahkema vat tehrîkêko giran biyo, coka cezayêk giran nêdayî joy. Bi kilmî mehkema qabê ke tay ceza bida, çi dest ra ame kerd.

Parêzerê mexdûran qerar rêşawit Yargitayî. Mahkemaya berz a Yargitaya 9'ine qerarê xo yê 2001'ine de cezaya mergî da 33 kesan, ro 4 kesan 20 serr, ro 1 kesî 15 serrî ceza birna. La qatîlê ku ameyî cezakerdiş tay tera hetê dewlete ra ameyî limitiş, tay tera bi destê dewlete şîyî teberê welatî. Heta tay tera bi bulteno sûre roci geyrê la karê dewlete de xebetîyê. Mesela yew qatilo herî girano ke qaşo dewlete di heme cîhanî de bi bulteno sûre rocê geyrê Cafer Erçakmak be. Nika yeno zanayiş ke Cafer Erçakmak serra 2011'î de Sêwaz de keyê xo de merd û mezelê ci Sêwazî de yo.


Serra 2002'ine de hişmendîya ê qatîlan di bin nameyê AKP'yî de bî îktîdar. Parêzerê ê qatilan heme di hikumetê AKP'yî de bîyî wekîl û bîyî wezîr. Henî cezakerdişê ê qatîlan mimkun nîyo. Serê qetlîyamî ra 20 serrî derbas bi la qabê cezakerdişê ê qatilan dewlete qet çîke nêkerde. Serra 2012'an de dewa wextra ameye girotiş. Fina heme qetlîyaman hesabê qetlîyamê Sewazî nêame persayîş û qatilê kurdan û elewîyan nêameyî cezakerdiş.

Erdoganî kefweşîya xo ard ziwan û vat; "Girotişê dewa ro şarê ma û ro welatê ma fîroz bo, zaf mexdûrî bibî". Gorê Erdoganî yê ku qetil bibî mexdûrî nêbî, yê ku qetil kerdibî mexdûr bibî.

Nêpersayîşê hesabê qetlîyamî yeno manaya dewamkerdişê qetlîyamê kurdan û elewîyan. Mixabin wextê hikumetê AKP'yî de bi desan qetlîyamî virazîyayî û hemay ke dewam kenê.




# Tirkîye cinîya kurde ra çi wazena?



Semra Turan

Ez no nuşteyê xo yê ewilî de wazena rêxistinê ma yê cinîya kurde binusna. Şima zî zone ke her cayê dinya de zilm û zordarîyêka pil ewil bi taybetî serê cinîyanê ke hemverê sîstemê camerd û dewletan de vindenî de esta. Înan ra yew zî hereketê cinîya kurde ya. Qet şik çin o ke her cayê dinya de aye ke cinî onceni yewbînî ra xoser nîyî. Ancak tekoşînê cinîyan zaf hetin a.

Cinîya kurde bi taybetî hem semedê azadîya xo û hem zî semedê azadîya şare xo tekoşînêko zaf pîl dana. Pê ena tekoşînê xo zî wazena şarê xo û cinîyanê dinya rê serkêşî bikera. Nimune; Cinîya kurde Rojawan de bi rêxistinîya xo bîye rol û mîsyonê pêroyê cinîyanê dinya ye. Cinîya kurde berpirsîyarîyêk xo rê referans girewte. La reyna zî Tirkîya de îqtîdar ewilî rêxistinê cinîyan hedef gêno û wazeno cinîyan bikero bindestê xo.

Devleta tirke tena cinîyê ke Tirkîye de cuyanê hedef negêna. Kesê ke teberê Tirkîya de zî cuyenê hedef gêna û hêrişê înan zî kena...

Tarîx de nimuneyê na rewşe zaf ê. Îqtîdar wina vano: Eke şima biwazê yew rêxistina ke cinî ci rê serkêşî kena padî, ewil bidêne cinîyan ro. Tirkîya zî xo rê înan referans gêna. Semede no zî bi konsepteko taybet ewil cinîyan hedef gena û wazena vernîya rexistinanê înan bigîra.

Dewleta tirke tena yew aşme de Amed de Komeleya Cinîyan ya Rosa hedef girewt û sere de Adalet Kaya û embazanê ci kerde zîndan. Komeleya Cinîyan ya Rosa Amed de semedê cinîyanê bindestê camêrdan û hemverê êrişanê înan de xebatanê muhîman kerdêne. Ancak aqilê camêrdan na rêxistine nêwaşt û hêriş kerd. Heme sîyasetmedaranê cinî yê kurdî tepişt û waşt ke îradeya înan bişikna. Dewlete bi konseptêko taybet hem teber û hem zî zere de cinîyan hedef gêna.

Dewleta tirke hewteyo verên zî Kobane de hêrişê hewayî pê arde û 3 heb cinîyê kurd qetil kerde. Nê cinîyan ra Zehra Berkel rêxistinê cinîyan de xebat kerdêne. Kobane semedê cinîyan pêroyê dinya ra hîna muhîm a. Kobane de cinîyê şorişgerî ra Arîn Mîrkana ke bîya sembole û bi hezaran cinîyî hemverê zîhnîyetê DAÎŞî de canê xo kerdî bombe û zerê înan de teqnayî… Û şexsê zîhnîyetê DAÎŞî de rêxistin û kesê ke wazenî cinîyan hedef bigirê û wazenî înan bikerê bindestê xo berteraf kerde. Şorişê cinîyan ewca de pê ame.

No pêrodayîş newe nîyo. Tirkîya timî 3 heb cinîya kurde hedef gêna û înan qetil kena. Înan ra yew nimune; Paris de Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan, Leyla Şaylemez, Silopî de zî Sêvê Demîr, Fatma Uyar, Pakîze Nayir û tewr peynî Kobane. Efrîn de sîyasetmedara kurd Hevrin Xelefe qetil kerde. Tirkîya her cayê dinya de cinîya kurde xo rê yew potansîyelê tehluke vînena û coka her ca de hedef gêna. Pêroyê înan de tena mesajêk dana. Mesajê dewleta tirke zelal o. Semedê cinîya kurde konseptê qirkerdişî dewre de yo.

Ancak nê heme hêriş û qetilkerdişan de mesajê cinîya kurde zî zelal o. Hîna zêde rêxistinbîyayîşê cinîyan û hîna zêde azadî…





Kewê Redkan

# Jina serbixwe...

Ez ji diya xwe hînbûme ku heval û hogirên xwe, ji dost û nasên xwe û cînarên xwe hez bikim, wan biparêzim û hevaltiyek baş bi wan re bikim. Hemû jî ji hevdu delaltir in, ez ji wan gelekî razî me, ew jî ji min.

Wexta em bixwazin, em demên pir xweş bi hev re derbas dikin, ya herî xweş jî her tim em alîkariya hev dikin û hevdu diparêzin li hemû deran. Dîsa rojek ji wan, rojên ku me xwest em bên cem hev û demeke xweş bi hev re bidomînin, min got; werin em li bin darên sincan rûnên, him bêhna darên sincan xweş e û him jî aveke zelal di ber de dikişe. Hemûyan got erê.


Bû danê nîvro, min hin xwarinên xweş çêkirin, çayê da ser agir, xulpexulpa çanîgê min, bêhna daran, bêhna çayê û bêhna gul û gupikan tevlihev bûbûn. Meriv hewas dike ku heta hetayê li ber wê bêhna xweş rûnê. Hemû hevalên min yek bi yek hatin, her yekê di destê wan de dîsa xwarinek an jî êmîşê bi destê xwe li ber tavê zuha kirine anîn danîn ser sifra min. Kêf û henekan em bi wir de û vir de birin, me xwar û bi ser de çaya xwe vexwar, her yekî ji me xwe li kêleka avê dirêj kir, lingê xwe kirin nava avê ji bona hênik bibin.

Piştî demekê Olcê got; wîî medê min diêşe, ew çi xwarin bû te çêkiriye, te çi xistiye nava wê xwarinê. Hema ez rabûm ser xwe, min jê re di nava bostanê xwe de hinek pûng û pincar çinî, di nava avê da keland. Vexwar, hinekî sekini, dîsa got; wîîî zikê min diêşe, min qeysiyên hişkirî dayê û jê re got; vana bixwe tu yê baş bibî. Navê wê Olce ye, me jê re digot Olcê, an jî carana digot Olê. Olê jineke ji xwe razî, bedew, hêja lê serbixwe ye, ew kengî dilê wê bixwaze biryara xwe û carana ya me jî dide lê ji ber hezkirina me ya jê re em dengê xwe dernaxin. Lewma em jê re dibêjin jina serbixwe.

Heta danê êvarê nehîşt ku ez qasekê li cem wan rûnêm. Na medê min, na zikê min, na serê min, na lingê min, na milê min, bi çûyîn û hatinê taqet di laşê min de nema, lê dîsa jî min dengê xwe dernexist. Ew hevalên min ên din lingê xwe ji nava avê derxistin, vegeriyan ji Olê re gotin, hey malmîratê ew azara te xwar, me jî xwar, tu dereke me naêşe, em aciz jî nebûn, tu jî û em jî dizanin ku hemû xwarinên wê xweş in, hemû kes dixwaze xwarinên wê tam bike, çi ji te hat?


Tu çi dixwazî ka ji me re bêje? Rabe ser xwe hêca ku hêrsa me bilintir nebûye, yanê em ê pir aciz bibin, ger kêfa te ji me re nayê rabe here mala xwe. Ji ber van gotinan, Olê got; weeey, min dizanîbû hin ji min aciz in lê min nedizanî ev acizbûna we ewqasî mezin e, ez ê rabim herim mala xwe.

Rabû û bi gotegotan ji me qetiya û çû. Dûra me bêhneke fireh girt, em li cem hev rûniştin lê dilê min û fikra min hê jî li ser Olê bû, dema ku ez rabûm û li alîyê malê fetilîm, min dî Olê li ber dîwarê mala min rûniştiye û digirî. Ez çûm cem, dema ez dîtim xwe avête himbêza min, giriya û got; min şaşitiyek mezin kir, min tu hetikand, ew dem min xwest tenê ez bala te bikişînim, lewma min cihaltiyek wisa kir lê hemû xwarinên te bi tevî te xweş in. Min bi destê wê girt anî cem hevalan, min got; ha ji we re hevala me ya serbixwe, îca niha em bi dilekî rehet ji xwe re rûnên, gilî û gazinên xwe bikin. Olê careke din di nav me de weke jineke taybet rûnişt, ew Olê ye, em jî wê wisa di nav xwe de xwedî dikin...




# Çîroka mîrê Botan û Ezeb axa

Li gorî gotina Silêman Axa, rojekê mirovek tê ba mîrê Botan û jê re dibêje zilamek der barê te de gelekî tiştên nebaş diaxive, navê wî Ezeb Axa ye. Mîr dibêje Ezeb axa zilamekî zana ye bawer nakim ku tiştekî wiha gotibe. Mêrik sond dixwe dibêje ew ji te xeber dide.




Mîr ji xulamê xwe re dibêje ez ê te bişînim pey Ezeb axa. Dema ku xulam dike biçe pey wî zilamê ku gelaciya Ezeb axa kiriye ditirse û di dilê xwe de dibêje niha ku axa were dê Mîr li pêş wî bêje vî zilamî gelaciya te kiriye û wê serê min bikeve belayê. Zilam izna xwe ji mîr dixwaze dibêje ez ê biçim. Mîr dibêje na nabe tu biçî, vaye xulamê min diçe Ezeb axa tîne vir. Dema ku Mîr dibîne ew zilam gelekî ketiye hev û diqilqile jê re dibêje; netirse ez ji Ezeb axa re nabêjim ku te ji min re gotiye. Tenê tu rûne û li me guhdarî bike.

Mîr ji xulamê xwe re dibêje dema te gazî axa kir bêyî ku haya kesekî jê çêbibe kulmekî ji axa gundê axa jî bi xwe re bîne. Xulam diçe ji Ezeb axa re dibêje Mîr dixwaze te bibîne û bêyî ku haya kesekî jê hebe kulmek axa gundê wî bi xwe re dibe. Werhasilî Ezeb axa tê dîwana mîr û ciyê ku dê lê rûnê jî destnîşankiriye. Mêrikê ku gelaciya wî kiriye jî li civata mîr rûniştiye.

Mîr dibêje Ezebo min bihîstiye ku tu der barê min de tiştên ne xweş dibêjî. Ezeb axa dibêje; tiştekî wiha tune ye, ez ê çawa bi nebaşî der barê te de biaxivim mîrê min. Mîr ji axa re dibêje ka em derkevin derve, mala mîr li ser cihekî bilind e û çem di ber de diçe, mîr dibêje ka em li ser banikê (şaneşînê) qehweyekê vexwin. Dema ku qehweya xwe vedixwin mîr bi dizî ji xulamê xwe re dibêje ew xweliya ku te ji gundê Ezeb axa aniye bibe bixe bin balgîfa ciyê lê rûniştiye. Xulamê wî diçe wiha dike.

Paşê vedigerin dîsa li ciyê xwe rûdinin. Mîr dîsa jê re dibêje te çima derheqê min de xeber daye. Vê carê nabêje libê di cih de dibêje çi ye, min xeber dabe jî xeber daye. Piştî demekê dîsa Mîr dibêje ka em derkevin derve hinekî û ji xulamê xwe re dibêje biçe wê xweliyê ji binê balgîfa wî derxîne. Piştî wê dîsa tên li cihê xwe rûdinin êdî Mîr berê xwe dide wî kesê ku gelaciya Ezebo kiribû û dibêje. Binêre sûcê Ezebo nîne lê xweliya hinek deran wiha ye.

# XAÇEPIRS



### JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ

1. Alaveke ku erdê zeviyan pê tê kolan
3. Qawêr, xîm, hîm, bingeh 5. Reş, neronahî.
6. Fayiz, dana pereyan ya bi feydeyeke mezin 7. Alan 9. Tûndbûn
12. Hunermendeke kurd 14. War, cih 15. Xerçkirina tiştekî ya zêde û ne di cih de 17. Sewaleke kedî ya bi keriyan tê xwedîkirin 18. Rok, roj
22. Bêxemî, xemsarî

### JI JOR BER BI JÊR

1. Heywaneke jehrî ku pêvedana wan mirov dikuje 2. Pêşkêş, araste, berpêş 3. Bêavî, qirikzuhabûn 4. Notayeke mûzîkê 5. Dawî 7. Serokê berê yê Lîbyayê Mûemer …... 8. Ol 10. Hêl, rex, la, qam, lay, teref 11. Berevajî, ne di cih de 13. Sefer, birêketin, çûn, dûrketin, koç 14. Bakur û başûrê tewereya ku di navenda dinyayê re derbas dibe; pol, qutub 16. Serok, rêveber (bi erebî) 19. Beşek ji xanî, mezel, xurfe, jor
20. Pevçûn, lihevxistin, nebaşî
21.Notayeke muzîkê 23. Agir

**Bersiva hefteya borî**





# Kareografiyên bi kilamên degbêjan

*Koma Mezopotamya Dansê bi kareografiyên bi kilamên dengbêjên mîna Sûsika Simo, Meryemxan û Şakiro projeyek amade dike lê projeya wan ji ber pandemiyê tê taloqkirin*

Bêrîvan Kayi

Serhat Kural nêzî 20 sal in, bi dansê re eleqedar e û di nav koma Mezopotamya Dansê de cih digire. Niha jî, bi projeyeke ku bi kareografiya kilamên dengbêjan hatî amadekirin dê derkeve pêşberî me.

Serhat Kural ê bi eslê xwe ji Tetwana Bedlisê ye, li Zanîngeha Mîmar Sînanê beşa konservatuarê ya dansê xelas kiriye. Niha jî li ser dansê perwerdeya bilind (mastir) dibîne. 20 sal berê bi dansên gelêrî yên kurdî (govend-dîlan) dest bi dansê dike. Di sala 2003'yan de jî di projeya folkdansê ya li ser destana Mem û Zînê de cih digire û bi vê dest bi dansa nûjen dike. Beriya vê projeyê jî lêgerînên Kural ên der barê cureyên dansê de hebûne. Piştî lêgerînan rêya dansên nûjen jê re vedibe. Heta îro jî ew lêkolîn û xebatên xwe yên li ser dansa nûjen didomîne. Hem bi kareograf hem jî bi performiriya xwe bi koma Mezopotamya Dansê re dixebite. Her wiha projeyan amade dike û bi kareografên biyanî re hewl dide rê li ber pêşketinên dansê vebike.

**Bi kilamên Sûsika Simo û Şakiro**


Koma Mezopotamya Dansê bi kareografiyên li ber kilamên dengbêjên wekî Sûsika Simo, Meryemxan û Şakiro projeyek çêkiriye. Ev dansa ku kareografiya wê ji aliyê endama Mezopotamya Dansê Yeşîm Coşkun ve hatiye amadekirin, ji ber sedema pandemiyê hatibû taloqkirin. Serhat Kural jî di vê dansê de bi kilamên dengbêj Şakiro kareografiya xwe pêşkêş dike. Der barê vê yekê de Serhat wiha got: "Lêkolînên me herî zêde li ser vê bûn; me digot gelo em çanda Mezopotamyayê bi dansên nûjen çawa derxin pêş. Hevala me Yeşîm Coşkun xwest, bi kilamên dengbêjan naverokekê amade bike. Helbet ev tema ji bo me ne tiştekî biyanî bû. Ji ber ku armanca Mezopotamya Dansê jî ji serî heta niha derxistinapêş a çanda Mezopotamyayê bû. Hevala me Yeşîm Coşkun, Nazli Durak jî bi kilamên Sûsika Simo û Meryemxanê dansa xwe amade kirin."

**Çanda nûjen û çanda kevnar**

Serhat Kural di axaftina xwe de bal kişand ser girîngiya tekstên dansê, wateya bi kilamên dengbêjan û wiha domand: "Helbet di çanda dengbêjiyê de nûjenî jî heye. Ji ber ku di mijarên wê de herikbariyek heye û mijar diyar in. Di mijarên wê de rol, îmge û karekter diyar in. Ji her berhemeke dengbêjiyê tekst dikare bê amadekirin. Karê me yê dansê, şano û muzîkê jî ev e, em hewl didin wê tekstê di hunerê de bihûnin. Armanca me ew e, em çanda kurdan heta ya êzidî, suryan û ermenan a qedîm bi hunerê derînin holê. Di her kilameke dengbêjiyê de bi rastî jî tekstên gelek balkêş hene. Yek bi yek li ser her hevokê me kareografiyek derxist û vê yekê jî karê me gelek hêsan kir. Bi kurtasî me xwest bi vê projeyê danseke nûjen, bi çanda dengbêjiyê re bînin cem hev."

**'Di her qadê de pêşketin hewce ye'**

Mezopotamya Dansê heta niha gelek mijarên cur bi cur lîstine û Kural der barê de ev anî ziman: "Me xwest bi taybetî çanda kurdan û bi giştî di nav çanda Mezopotamyayê de ew nasnameya ku bi rengekî û çandeke serbixwe, taybet û dewlemend hatî avakirin, bi hunereke naîf derxînin holê. Em kurd hewce ye di her qadê de bi pêş bikevin. Îro em dibînin ku di nav çanda kurdan de herî zêde muzîk bi pêş ketiye, sînema û şano jî hêdî hêdî bi pêş dikevin lê mixabin di karê wênasazî, peyker, dans û gelek beşên din de tu pêşketinek tune ye. Me jî bi van cureyên dansê xwest ku pêşketinek di vê qadê de jî çêbibe û ev yek bi çanda vê axê ve girêdayî be, bi çanda me kurdan ve girêdayî be."



**Albuma Dîwana Dubeytî**


Serhat Kural piştî xebateke demdirêj a 6 salan, albumek ji çarînên Baba Tahirê Uryan (Dîwana Dubeytî) bi strandina 12 muzîkjenan, bi terzeke nûjen amade kiriye. Kural di serî de xwestiye xwe di dansê de bi pêş bixe û di van salên dawî de berê xwe daye muzîkê jî. Kural çend roj berê strana bi navê 'Kovî' ya gotin û muzîk eydî wî ne, bi dansa xwe wek klîb li ser platformên dijîtal parve kir.



Weswese 2

Şener Ozmen

# Li Çola Xwedê!


SAL 1
HEJMAR 3
DUŞEMB
1 HIZÊRAN 1942

RONAHÎ

ANNÉE 1
NUMÉRO 3
LUNDI
1 JUIN 1942

SUPPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR

MISTER ÇORÇIL SEREKWEZÎRÊ INGILTERÊ LI TANGEKE NÛ TEMAŞA DIKE

ŞAM—1942
CAPXANA SEBATÊ

Xwedê kesî bêwêne nehêle! Qesda min dîtbarî ye helbet, heke te hiş û bîreke di heman demê de bi dîtbariyê xemilandî –vêga min têderêxist ku xemlandin li vê hevoka ku min dixwest ez bi awayekî din û bi têgihine din saz bikim, naye, ya ku wesweseyên min dinermijîne, pê re pê re dihelîne– nebe, bêgav dimînî ku xwe bispêrî tiştine din; ew jî gelek caran –û di destê gelek bergsaz û afîşsazên kurd de– dibe dîtbariya dijraber; bo mînak (û pirsek); heke li ber destê we wêneyekî Şêx Seîdê Pîran tune be, aya hûn dê wêneyê zabitên (qeterehmên) ku ew bi dar ve kirine bi kar bînin? Heke heya hingê ti şêwekarên kurd çi bi pênûshibrê çi bi boyaxên din wênesûretekî nîgaşî yê Şêx Seîd çênekiribe û tew nedabin çêkirin, hûn dê wêneyê sêdarekî bi kar bînin yan çi? Çima sêdar? Çima wêneyê kêlîkên bidarvekirina Qazî Mihemed û hevalên wî yên din yên têkoşer? Çima wêneyê qirqirina Dersimê, yê ku jinên kurdan, zar û zêçên wan tazî û îpela û bi qeyd û zincîran ve kirî û doranên wan bi zabitên Roma Reş dorpêçkirî dide xuyanê? Rast e, welê ye, ev jî parçeyeke mêjûya me (trajediya me) kurdan e lê dîtbariya têkildar? Ew ji ku tê, ji ku hatiye û bi kîjan mebestê hatiye kêşan û bûye belge? Wênegiriya leşkerî, çapemeniya ku ji artêşê re kar dike, ne wisan? Lêbelê wer dixuye ku ev alozî ne bi tenê di mêjûya dûr (kevnare) û nêzîk (nûjen) ya kurdan de ye; em bi her awayî ji dîtbariyê bêpar mane, heman gravûr in yên ku em di bergên pirtûkên mêjûyî de –baş e ku bi tenê yên mêjûyî de– bi kar tînin; siwarekî kurd, siwarên kurd û dîsan siwarek… ku gelekên wan hîn başebaş nehatine çespandin wekî berra jî kurd in yan –wek mînak ecem, gurcî, asûrî, ereb, heye ku tirk– ji neteweyeke din in. Raboriyek heye (temam me siwarîyek jî heye) lê çi gava em dibêjin Ji Doh Heya Îro Kurd, pozikê rima wî siwarîyî tê û digihîje îro jî, ma gelo derheqa îro de me çi nîgaş nîn in? Barthes bû digot, "Heye ku şayesa Tuneyîyê bûbûya Livirbûyîn (ez ya/yê dinê her roj dibînim, dîsan jî ez jê bêpar im). Obje li vir e, berra jî li vir e, lê di venîgaşiyê (muxayîle) de her û her kêm e ji bo min."

***

Nizanim bê hûn carcaran çavek li kovara 'Ronahî'yê digerînin yan na, di nav hejmarên wê de ji xeynî salix û silûxên têkildarî Şerê Cîhanê yê Duyemîn û çek û posatên dewletên bi qirika hev girtî, çîrok û metelokên li ser rewşa kurdan jî li gorî şert û mercên wan çaxan, çap bûne ku yek ji wan jî axaftineke balkêş e, ku di navbera Celadet Alî Bedirxanî (xwedîyê kovarê) û dota wî Sînemxanê de (xwînereke kovara Hawarêye jî) li ser rewşa kovarê û 'nexweşikbûna wê' li dar ketiye (bnr. Ronahî, Sal: 1, Hejmar: 3, Duşemb, 1 Hizêran 1942), ya ku li ser bergê wê wêneyê Winston Churcillî cî girtiye, bi vê jêrnivîsê; "*Mister Çorçîl Serekwezîrê Ingilterê Li Tangeke Nû Temaşe Dike*", navê metelokê jî '*Sînemxan û Resmên Ronahîyê*' ye.

Hejmara Ronahiyê a duduyan derketibû, min jê çend nivişt anîbûn mal. Çavê Sînemxanê pê ket û ji min pirsî:

–Bavo ev Hawar e an Ronahî ye?

Min got: keça min ev Ronahî ye, Hawara nû heta çend rojan wê derkeve.



–Ji kerema xwe ka yekê bide min?

Min nivîştek da Sînemxanê. Ronahiya xwe kire ber xwe bi dîqet li resimên wê temaşe kir. Piştî ko temaşe xwe qedand, serê xwe hilda û gote min:

–Bavo ev Ronahî ne qenc e, a din jê çêtir bû.

Min got: keça min, ji berevajî ev Ronahî ji a din qenctir e, resimên wê bêtir in û bi tevayî ji a nivişta pêşîn lihevhatîtir e. Sînemxanê li min vegerand û got: na Bavo, ev Ronahî ne sipehî ye. Resimên tê de hemî resimên apê ingilîz û eskerên apê Lézgo ne –yanî frensiz, tu resimên kurdmancan tê de nînin. Di a din de resimên kurdmancan hebûn; kurdmanc direqisîn.

Li ser vê yekê Celadet tîne dibêje; "*Belê Sînemxan xebera te ye. Lê tu dizanî ko dinya şer e û her tişt giran bûye, em nikarin ji nû ve klîşan bidin çêkirin. Bi klîşeyên hazir û berdest em bes dikin. Kanî resimên kurdmancan, ji xwe resimên kurdmancan li nik me nînin.*"

Di rûpelên ku ev metelok (anekdot) tê de hatiye weşandin de jî (rûpelên 30 û 31an), ji qewlê Celadetî ve çar klîşeyên şerî hene; *Topege Tangsikên Ya Ordiwa Ingîlîzî, Ji Eskerên Frensa Aza Hêştirsiwarên Beriyê, Klîşa Jorîn: Frensizeke tîhin cewdikê avê bera ser xwe daye û avê vedixwe, Klîşa Jêrîn: Topeke Italyanî a balafirşikên. Frensizên aza ev top ji Italyanan standiye û niho bi vê topê bera balafirên Italyanan didin*. Barthes, di xwendina xwe ya nuwaze de qala vê tundîya di wêneyan de dike, ya ku hîn ji serê serî de weke mijareke çandî (studium) têlkildarî wê bûye, vê yekê (bi gotina wî vê punctumê) êdî weke tiştekî ku aydê teşeyê be nabîne, çi ku ji xeynî hûrgilîyan, rastî hin punctumên (xalên) dilşewat jî dibe, hingê tîne dibêje "*Ev hebû*", êdî gotinên Celadetî berceste dibin, resimên (wêneyên) kurdmancan li nik me nîn in, yên ku Sînemxanê daw û doza wan dike.

Nemerdî nake û radibe diçe resimekî xwe yê digel Cemşîd tîne û dide destê bavê xwe, dibêje:

– Ev e ji te re resimekî kurdmancan, ma ez û Cemşîd em ne kurdmanc in?

Cemşîdê ko heta hingê têkilî şitexaliyê nebûye, gava navê xwe dibihîse, bêyî ko zanibe bê qala çi dikin, berê xwe dide wî û dibêje;

– Belê Bavo, ez jî kurdmanc im, ez torinê Mala Azîzan im.

"*Zarowan zora min biribû, min nizanîbû ez ji wan re çi bibêjim. Heq di destê wan de bû lê min nedikarîbû ez daxwaza wan bînim cih. Min resima wan kire kûrika xwe û berê xwe da çapxanê.*"

Axir min got, em bêpar mane, hinekan em bêpar hiştine û di vî warî de em hîn ji "*Ev hebû*"yê çiçkek jî bi pêş de neçûne. Belkî jî divê em rê û dirbên nû yên vedîtin û xwendinê (li ser asta nihêrîna li mêtingeriyê, li çanda wê ya dîtbariyê û hiş û bîra wê ya nûjen ya bi dîtbariyê afirandî) bibînin, ji xeynî pozikên rimên bavkalikên xwe yên dêrîn yên ku cîtî dilê îroya me jî dibin, ji bo danana arşîveke hişwerane ya dîtbariyê xebateke bi rêk û pêk bikin. Mûsa Anter, çaxa qala meseleya xwe û çapa rojnameya Ileri Yurdê dike, dibêje; "*Lêçûnên rojnameyê gişî li ser min û Canip Yildirimî bû. Gava min ji xwediyê rojnameyê Evdirehman Dolakî re qala bimirêsiya nivîsan kir ku qet nedihatin xwendin, wî ji min re got, kekê mişk bela xwe di balorê (merdane) dane, hibrê nastîne…*"

Nexêr em ne bêgav in, çend wêne û klîşeyên din jî divêt hebin ku em têxin bêrîkên xwe û ji îro de berê xwe bidin çapxaneyên li dahatûyê, yan na bi mishefa we xwendî, li vê Çola Xwedê ji bilî nîgaşa sîsarikên ku goştê berateyan ji niqûlên hevûdin direvînin, dê tiştekî me nemîne!

"

xwebûn

6-12 Tirmeh 2020 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 4 TL Hejmar: 29

*İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:* Kadri Esen
*Sorumlu Yazıişleri Müdürü:* İdris Gürmez
*Yayın Danışma Kurulu:* Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
*Yayın Türü:* Haftalık Yaygın Süreli
*Yönetim Yeri:* Kooperatifler Mah. Gevran Cad. Akkoyunlu No: 5/13 *Yenişehir / Diyarbakır*
*Baskı:* Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı *Bağlar / Diyarbakır*

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85

# Dewkula kurdî

Felat Nishtiman



Me yê qalikê hinarên şîrîn hişk bikira, têr di conî da bikuta û bianiya bêjing bikira. Me şev û mast û tûfilhinara xwe tev di dewkula xwe dida. De îcar wisa xweşik dibû. Roja din me dewê xwe tê da dikula

Bi biharê re pez ji gomê derdiket, diçû çêrê. Bîn û bereketa gil û giyayên çolê, li pez jî digeriya û serzê diketê. Êdî wexta bêrîvan, dotin, dangî û dewkulê bû. Heta şivanek dihat girtin, em diçûn ber pezê xwe. Pîra min her roj bi serê tavê re, bi dengekî nermik ê lorînî digot, 'de rabin kurên min de rabin, roj hatiye nîvro, xelkê pezê xwe bir di guharên Dono de derxist, hê hûn razayî ne; de rabin berxên min de rabin, wa min qeymaxê we daye ser nan, di bin merkevê de ye; de rabin pez di nav qesarê de heşir bû...' û digot û hey digot...

Bi dengê wê re, car hebû em ji ciyê xwe vediciniqîn, radibûn ser xwe; car jî hebû bi çavên nîvvekirî hema bi zorê, bêyî hemdê xwe radibûn ser xwe; me radikir nanê xwe yê biqeymax û em diçûn ber pezê xwe. Lê ne roj hatibû nîvro, ne jî pezê xelkê di guharên Dono de derketibû. Serê tavê nû derketibû û hema meriv dizanibû wa zeraqên tavê avêtine serê girê Ledo.

Hin dengên zaroktiya meriv dibin melodiyên efsûnî di hişê meriv de û her dilorînin. Çi bikî, çawa bikî, nikarî xwe li wan dengan daneynî. Melodiya min a efsûnî jî dengê pîra min e. Ew deng e, carcaran ji nav serpêhatiyên zaroktiya min bi lorînî gazî min dike.

Xwediya wî dengê efsûnî yê zaroktiya min, îro ji serî heta binî behsa çêkirina dewkula kurdî dike; ya pê dew û jiyana me dihatin kulandin. Ka em bala xwe bidinê, dewkula me ya kurdî bi çi zor û zehmetî, sebir, ked û zanebûnê hatiye çêkirin. Kerem bikin, em guhê li pîra min Xecê mûç bikin...

"Te bizina şîr şerjê dikir û kunkî derdixist. Ji qemçika wê, te digura. Milê xwe hildida û dikir nav goşt û eyar, bi pêçiyan te vî eyarî ji vî goştî dikir. Te dianî di dev da derdixist û dadileqand. Îcar xweliya dara mazî me li bêjingê dixist. Di avê da me yê bikelanda, te avê ji ser da digirt û vê lepoxa wê dibû weka mastê kîs. Tevî mû, te yê eyarê xwe vejî bikira danîna ser pot. Te yê alî mû têkira hundir, te yê şûna goşt li derva bihiştana. Te yê bi carekê bi xweliya dara vê dewkula xwe bidûta. Te bezê wê jê dikir. Hingilê wê, gidêşa wê me sax didût bi vê xweliya daran. Me yê li hevdu bilefanda têkira nav potkî û datanî kêleka kuçik ji bû miyê xwe bida. Ew ê heştekî tê da bima, piştre wê miyê xwe bida û me yê ji mûyan paqij bikira. Me yê dewkula xwe vejî bikira û li avê bixista. Me yê têr paqij bikira û me yê bianiya kêr bikira. Heta dibû weka kefa destê meriv û mû pêva nedima. Û me yê weka balorê piv bida. Me sê çar kesan piv dida. Îcar me yê cilêt bikira heta piçkî mû pêva nedima. Pivdayî dianî datanî ba kuçik ku dû bigire û ji bo debaxê bigire.

Me payîzê dest bi çêkirinê dikir. Di adarê da me dikir debaxê, ji ber ku ne tava wê tûj bû, ne jî serma wê hebû. Me yê botavê bêjing bikira, girê wê jî bikelanda. Alî mû jî me bînkî sabûn lêdixis, dibû weka çiftexas. Şeva spî jî te yê têkira ava teştê bihelanda, te yê dewkula xwe têkirayê û debaxa xwe jî têkirayê û te yê cî bi cî mizda. Piştre te yê biqelabta alî din. Te yê wî jî têr mizda. Te vejî dikir û bi vî awayî sê rojan di bûkikê da dima. Me digot bira kes nebîne, ji bû nezerî nebe. Gere kesê dewkula me nedîta. Xwedê zane nezerî dibûn me diceriband, dibûn.

Destê me dibûn weka hinê. Pazdekî dewkula di debaxê da dima, êdî hema tavê bida kê derê me dida ber tavê. Biharên berê pir gelêle bûn, tav tinebû. Ley radibûn, pez pê ra diçûn. Rojê du car me miz dida. Ku ava wê biqediya, me av lê zêde dikir. Me didî êdî girtiye, me yê lolepa lêxista û me yê bibira ber kaniyê xîşika têxistayê û bikula û bikula û bikula heyyya ava zelal jê dihat. Du heb qîzik dikulan, me digot xweş dibe bereket dikeve rûn, qîzeka qîzîn e bi bereket e.

Me yê qalikê hinarên şîrîn hişk bikira, têr di conî da bikuta û bianiya bêjing bikira. Me şev û mast û tûfilhinara xwe tev di dewkula xwe dida. De îcar wisa xweşik dibû. Roja din me dewê xwe tê da dikula. Îcar bîna debaxê jê dihat hinka jê hez dikir, hinka jê hez nedikir. Cîkî du ciya jê dihat paşê paqij dibû. Me dewkula xwe davêt sêpiyê. Me yê bikula û dewê wî vala bikira û rûnê xwe jî têxista elbika darîn û me yê têr bişûşta rûnê wî spî bû. Me yê têr xwê bikira û me yê têkira kûpikê xwe.

Carna meriv rehet nedibû, me du kesan dikula. Ku dinya cemidî bûna dereng çêdibû û germ bûna jî jixwe dimeliqî. Şîrê êvarê me diguhast, şîr pir bû heta evarê bi zorê dihat haveyn. Nedibû em bikulin. Tirş nedibû, şîrîn bû. Wî mastî me dihişt roja din, ê roja din jî têkira şûna wî. Di royê da nedihat kulanê, ji ber vê dihat guhastinê. Ê sibê dihat kulan lê yê êvarê nedihat kulan. Şîr pir bû xelkê di teştan da dimeya.

Me digo bira dewê me nemeliqe me dikula. Dewkul êdî dibû, qul dibû. Ji dara kevotê me çekan çêdikir. Lolepa kêriyê van tiştan me dikirî. Bi şimayê bi tayê xav, bi dirêşê me didirût ciyê qul didirût. Kesê nizanibû penêr çi ye, me şîrê xwe tev dikir rûn."

***Vebêj:** Pîra Xecê*

***Herêm:** Farqîn*



# Emrê mirovan çend e?

Takî Çiftsuren

Ji zaroktiya min heta îro, ez dikarim bibêjim du pirs hene qet ji bîra min naçin: mirî pir in an zindî, emrê însanan çend e?

Bersiva herduyan jî ne xema min e. Lê dîsa jî ez dixwazim der barê Danteyê, 720 sal berê gotiye "emrê mirovan heftê sal e" çend gotinan binivîsim.

Ez dibêjim qey li ser rûyê cîhanê di nav xwendavanan de, tu kesên ku Dante nas nekin tune ne.

Ger hûn ji yekê/î bipirs, qet nebe dê hûn ê bersiva "Dante nivîskarê komediyayê ye" bibihîzin. Tenê tiştên derheqê wî de tên zanîn pirê caran hew ev qas in.

Dante avakerê zimanê îtalî, nivîskarê komediyayê, aşiqê Beatriceyê û yek ji pîrên wêjaya cîhanê ye.

Dante di dozdeh saliya xwe de cara ewil Beatriceyê dibîne. Dil digire. Beatrice wê çaxê hê neh salî ye. Cara duyem, piştî 9 salan, gava wê dibîne, Beatrice êdî 18 salî ye. Dante, di pirtûka xwe ya Jiyana Nû de, qala vê bûyerê dike.

Piştî demeke kurt Beatrice dizewice. Lê dilê Dante qet ji wê sar nabe. Çend sal şûn de, Beatrice dimire. Dante şîna wê digire. Piştî demekê, dikeve pey wê. Dixwaze here wê bibîne û bîne. Di komediyayê de Dante qala vê rêwîtiya xwe ya sembolî dike.

Komediyaya wî ji sê cildan pêk tê: Dojeh, Araf û Bihuşt.

Naveroka pirtûkê di vê nivîsê de me eleqedar nake loma jî em li pey naverokê nakevin lê derheqê teknîkê de, ez dixwazim hin tiştan bêjim.

Dante komediyaya xwe bi îtalî dinivîse. Dema bi îtalî dinivîse, li welatê wî zimanê wêjeyê zimanê latînî ye. Heta wê çaxê, ji xeynî çend stranên gelêrî, bi îtalî berhem nahatine nivîsîn. Dante dest bi karekî zehmet dike. Bi zimanê xwe dinivîse. Bi helbestî, bi Terza-Rîmayê dinivîse.

Ji her beşa komediyayê re Kanto tê gotin. Dojeh, ji 1+33 Kantoyan pêk tê. Kantoya yekem weke beşa despêkirinê ye. Di vê Kantoyê de qala armanca rêwîtiya xwe dike. Araf û Bihuşt jî, her yek ji 33 Kantoyan pêk tê. Yanî komediya bi tamamî 100 Kanto ye.

Dante di destpêka Dojehê (Kanto 1) de, dibêje: gava roj bû nîvro/ min dest bi rêwîtiya xwe kir. Ev "nîvro"ya wî, di vir de sembol e. Yanî dibêje, gava min nîvemrê mirovan kir, min dest bi rêwîtiyê kir.

Li gorî Dante emrê mirovan 70 sal e. Nîvê emir jî 35 sal dike. Yanî Dante di 35 saliya xwe de dest bi rêwîtiyê dike. Di vir de gere meriv pirsek bike: Dante li gorî çi dibêje emrê mirovan 70 sal e?

Dante li gorî Mezmûran dibêje (li gorî Zebûrê) di Mezmûra 90'î de rasterast ev hevok derbas dibe: emrê mirov heftê sal e. Dante vê hevokê digire û jixwe re dike hêma.

Dibêjin Dante di sala 1265'an de ji dayika xwe bûye.Ya rast, roj û sala jidayikbûna Dante rasterast nayê zanîn. Ji ber ku dizanin wî di sala 1300'î de dest bi rêwîtiya xwe ya sembolî kiriye. Ji 1300'î 35 derdixin û sala jidayikbûna Dante bi dest dixin: yanî 1265.

Wek hesabê ebcedê, bi şîfreyan sala jidayîkbûna wî hesab dikin.